

# nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

Hejmar: 7

Sal: 1

Nîsan 1993

Biha: 10.000 TL

## Tevkujiya Helebçe jibîr nekin!



# KOVARA ÎSLAMÎ YA KURDÎ (KÛRTÇE ÎSLAMÎ DERGÎ)

## nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat  
(Aylık Kültür Sanat Edebiyat Dergisi)

**HININ DIXWAZIN ZIMAN Û ÇAND**

**Û HER CÛR HEBÛNÊN KURDÎ YÊN DIN, JI HOLÊ**

**RAKIN. WAN KÊFXWEŞ NEKE. KOVARA NÛBIHAR**

**EWILÎN KOVARA ÎSLAMÎ YA KURDÎ YE. BIXWÎN, BIDE**

**XWENDIN Û JÊ RE ABONEYAN PEYDA BIKE. EV,**

**MESÛLIYETA TE YA ÎSLAMÎ Û ÎNSANÎ YE.**

(BIRILERÎ KÛRT DILINI, KÛLTÛRÛNÛ VE

HER TÛRLÛ MEVCUDIYETINI ORTADAN KALDIRMAK

ISTEMEKTEDİR. ONLARI SEVİNDİRME. NÛBIHAR İLK

KÛRTÇE ÎSLAMÎ DERGİDİR. OKU, OKUT VE ABONELER

BUL. BU SENİN ÎSLAMÎ VE ÎNSANÎ GÖREVİNDİR.)

### **weşanên nûbihar**

### **(nûbihar yayınları)**

**Rîsala Biratiyê / Seîd ê Norsî**

**Peyivên Piçûk / Seîd ê Norsî**

**Rîsala Biratiyê (Bi herfên Erebî)**

**Peyiva Bîst û Seyemîn / S. Norsî**

**Şırnak Baskını / Osman Resulalan**

**Bediuzzaman'ın Hayatı / Abdurrahman "N ursî"**

**Di xwestinê we yên tevayî de, kitêbên Kurdî bi 30 %  
û kitêbên Tirkî bi 40 % erzanî tèn şandin.**

(Toplu isteklerinizde Kürtçe kitaplarımız % 30,  
Türkçe kitaplarımız % 40 indirimle gönderilir.)

**Navnîşan (Adres)**

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih/İstanbul

Tel : 533 75 88 - 524 00 38

**Xwedî**

(Sahibi)

**MAHMUT YARLUĞ**

**Berpirsiyarê Giştî**

(Genel Yayın Yönetmeni)

**SABAH KARA**

**Berpirsiyarê Nivîsaran**

(Sorumlu Yazışleri Müdürü)

**SÜLEYMAN ÇEVİK**

**Mudîrê Tîprêzî û Arşîvê**

(Dizgi ve Arşiv Müdürü)

**ALİ KARADENİZ**

**Muşawîrê Nivîsaran**

(Yayın Danışmanı)

**MUSTAFA GOYANI**

*nûbihar* kovareke mehanî ye ku bi weşandina karpêkên çanda Kurdî bi mana tevayî dilebîke. Raman û rayên xwedyên karpêkan, lîzûmen ne raman û rayên *nûbihar* in. Nivîsaranê ku bi îmzeyê Berpirsiyarê Giştî weya bi navê *nûbihar* ten weşandin raman û raya *nûbihar* nişan didin. *nûbihar* di serrastkirina karpêkên şandî de azad e.

**Bedela abonetiya salinî:**

**Lî hundir: 120.000 TL**

**Lî derve: 50 DM**

**Jimareyên hesabê:**

**Lî hundir: Postgiro** (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

**Lî derve: Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770**

**Navnîşan (Adres):**

Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt.  
No: 51/3 Fatih - İstanbul

**Tel:**

524 00 38 - 533 75 88

**Tîprêzî (Dizgi):**

*nûbihar*

**Berg (Kapak):**

**Dönüş**

**Çapxane (Matbaa):**

**Mutlu Ofset**

# *nûbihar*

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

## DESTPÊK

- Tevkujiya Helebçe jibîr nekin!.....3

*nûbihar*

## SERNIVÎSAR

- Bila êdî tevkujiyên nû çênebin!.....4

**SABAH KARA**

## AYETNAME

- Çend ayetin ji Qur'an a Mecîd .....5

**AZAD ZELAL**

## BERG

- Sêwiyên ummetê .....7
- Helebçe: Mirêka zalim û mazlûman .....8
- Pênc hezar kulîlk .....10
- Helebçe em te jibîr nakin .....12
- Qabiliyetên qurmiçi yan jî Helebçe .....14
- Birîna xedar .....17

**ABDULLAH PINAR**

**NACI GÜLMEZ**

**SÜLEYMAN ÇEVİK**

**MUSTAFA YILDIZ**

**ELİ KARADENİZ**

**ELİ HİKMET TEKİN**

## BANÛNAME

- İslam û jin .....18

**ZEYNEB AMED**

## TARİXA EDEBIYATA KURDÎ

- Elî Herîrî .....21

**ZEYNELABİDİN ZINAR**

## ÇÎROK

- Kî aşitî naxwaze!.....15

**BAGER**

## HELBEST

- Keça piçûk .....16
- Medresa Horhor .....16
- Nameyên bêcewab / 6 .....20

**NAZIM HİKMET / HOZAN OFLAZ**

**M. ŞAKİR Ê KOÇER**

**SABAH KARA**

## ZAROKNAME

- Qendîla piçûk .....23

**XESSAN KENFANÎ - SABAH KARA**

## ZAZAKÎ

- No mergê çendyo? .....13

**ABDULLAH ALPER**

## WEŞANNAME

- Bi helbestên Kurdî dengê İslamê .....27

**REÛF XWEDÊPEREST**


## NAMEYÊN WE

- M. Seîd Temel .....29
- M. Emîn Ozdemir .....29
- Bedirxan Ekin .....30

**FERHENGOK**

- Rêzêpirs .....31

**ELİ KEÇELİ**



# TEVKUJIYA HELEBÇE JIBÎR NEKIN!

nûbihar

**B**erî nuha bi pênc sala em li Helebçe bi tevkujeyke nû rûbirû hatin. Tevkujeyek din bû ev; lewra tarîxa Kurdan bi van cûr tevkujîyan ve ti-ji ye.

Tarîxa Kurdan bi van cûr tevkujîyan ve tîjî ye, erê; lêbelê çima?

Çima em di vî halî de ne?

Çima rehmet li hineka dibare, lê bombe li me?

Çima xelq û alem, ez naxwazim bibêjim bê çi dikin, û bi dewsa hevûdu avê li me dikin?

Na, heyran, xwezî bi avê! Bombeyan bi ser me de dibarînin. Û xwezî bi bombeyan jî. Jehrê bi ser me de dibarînin. Him jî çi jehr! Siyanûr û xerdel!

Ma hûn zanin ku *siyanûr* û *xerdel* çi ne?

Siyanûr xazehreke pîrî xeternak e. Meriv di heman hengama ku vê jehra xazî tenafus dike, bêfasile helak dibe.

Lê ev hê lêlê ye, lolo şunde ye!

Lewra wextê ku meriv di bin tasîra siyanûrê de dimîne, dimre û karê wî tamam dibe. Lêbelê xerdel ne wisa ye. Xerdel heta ku dikuje, çavê bavê meriv derdixe. Meriv şerpeze dike. Laşê meriv cihêcih avê dicivîne. Di laşê meriv de girêkê avê çêdibin. Paşde hucrên bedena meriv dimrin û pûç dibin.

Jehra xerdel di sala 1854 de îcad bû. Alamanan di Cenga Cîhaniya Ewil, sala 1917 de ji vê jehrê li ber Îngîlîzan îstîfade kirin û 14 000 mirov ji ber vê jehrê telef bûn.

Paş re hemû çekên kîmyewî bi şiklê qanûneke navnetewî, hatin qedexekirin. Lêbelê zalimên xwînxwar li ber mazlûm û belengazan di her firsendê de ji van cûr çekan îstîfade kirin.

Emerîka di cenga Vîetnamê, Ûrisya di cenga Efxanistanê, Iraq jî di cenga Îranê de ji van çekan



îstîfade kir.

Pîştî ku Iraq dît ku ti kes li ber neseqinî, rabû ji van çekan li ber Kurdên belengaz jî îstîfade kir. Ne tenê li Helebçe, lêbelê li her cihê ku firsend kete dest, bi hêsanî û bi malîyeteke pir îpir naçîz, bi sayeta van çekan hezaran belengaz û xizanan helak kir. Û dewletên ku wextê mirovek ji wan dibêje "ax!" qiyametê bi serê me de dirakin, li ber van tevkujîyan lal û bêdeng man. "Şampiyonê Aşitiyê" bi dewsa avê, agir û pêt li vê şewatê zêde kirin.

Heta kengî? Heta ku cenga Iraq û Îranê tamam bû û Seddam ê seg vejeriya, kir ku xwedyê xwe gez bike. Wî wex-

tî dinyaya ku li ber tevkujîyên wî bêdeng mabû, rabû ser piyan. Êdî ne qatîlbûna Seddam ma û ne dagirkerbûna wî... Hemû defterên wî derketin holê û dewletên mîna Tirkiyê ku îstîfadekirina Seddam ji çekên kîmyewî tim î tim red dikirin, êdî Helebçe ji xwe re kirin mortal û bi kêf û şadî borezancîtiya Emerîka pêk anîn.

Ma kî van çekan bi Seddam ê xwînxwar da? Kî ji wî xebîsî re febrîqeyên çekê kîmyewî çêkir? Ma ne ew "şampiyonên aşitiyê" û patronên rûreş î-bi îstîlah- "Neteweyên Yekbûyî" û "Sazûmana Ewlekarî"?

Erê hevalno! Gereke em tevkujîya nemirovaneya Helebçe û hemû tevkujîyên din jibîr nekin. Lêbelê jibîrnekirin ne kafî ye. Gereke em bixebitîn ku cardin ev cûr tevkujî û zilm û tada neyên serê ti kesî.

De haydê hevalno! Êdî dem, dema me mazlûman e!

Heta hejmara hatî...

Selam û rehmet û bereketa Xweda yê qehharê zaliman li ser we be.

# BILA ÊDÎ TEVKUJIYÊN NÛ ÇÊNEBIN!

**G**ereke em tevkujîya nemirovaneya Helebçe jibîr nekin û bixebitin ku em carek dîn tevkujîyek mîna vê tevkujîyê nebînin û nejiyin.

Di vê babetê de ez îhtiyac nabînim ku tişteke nû bibêjim. Ez dixwazim vê helbesta xwe ya ku min di Gulan a 1988'an de nivîsandiye û di kitêba xwe ya bi navê *Doğu Ağuları* (: *Mersiyeyên Robilal*) de weşandiye, vê carê bi zimanê kurdî teqdimî we xwendevanên ezîz bikim.

Lewra wextê ku peyiv diqede û merev êdî nikare tiştêkî bibêje, seltaneta helbestan dest pê dike!

## MERSIYE JI BONA ZAROKÊN KU LI HELEBÇE HATIN QETILKIRIN

Hûn wisa dilgeş û kamran in ku êdî  
Tevkujîya zarokan jî nikare we xemgîn bikê  
Ma ne em bûn ku me nalîna mazlûmekî  
Zelzeleke cîhanî qebûl dikir ji bona herkesî

Berê mirî nefesa xwe ya talî didan û dimirin  
Li Helebçe zarok ji vê jî hatin mahrûmkirin  
Dayikan we çima me nefetisand hengama welidandinê  
We çima me mahkûm kir ku em bibînin vê rezaletê

Ew ku çiya nikarin rahêjin vî barî, ma çawa  
Wê rahêjin milê me van hemû tabûtan bi carekê  
Hîroşîma, Vîetnam, Efxanistan, Filistîn  
Têr nekir xwîna zarokan Dahhak û Taxûtekê

Heyfe ku em bi qasî Kawa jî nehatin ku Kawa mir  
Lê Dahhak hezaran Dahhakan welidand bicarekê  
Bila bigrî welatê Selaheddînê binavûdeng ê min  
Bila bigrî Qudsa ezîz li ser vê qederê

Gelo em çawa dijin di bin vê zilletê de çawa  
Mîna keriyek şeytan, keriyek lal, keriyek filan bêvan  
Bila di mêjiyê me de biqede qiyamet ko wê biqedê  
Yan tewreke birûmetanê, yan bila tevkujîyeke ûmûmî biqedê

Sabah Kara

# ÇEND AYETIN JI QUR'AN A MECÎD

AZAD ZELAL

## SÛRETA BEQERE

*Bi navê Xweda yê  
mihrîban û dilovan*

151- Û Me peyamberî ji we re şand ji we, da ku ayatê Me ji we re bixwîne, we pak û pakîze bike, bi we kitêb û hîkmetê hîn bide û tiştê ku hûn nizanin bi we hîn bide.

152- Naxwe Min zikir bikin (û jibîr nekin) da ku Ez jî we zikir bikim (û jibîr nekim); ji Min re spasê bikin û nespasiyê nekin.

153- Ey hûn ên ku we îman aniye; bi sebrê û nimêjê arîkariyê bixwazin. Muheqeq ku Xweda bi se-birmendan re ye.

154- Û ji kesên ku di rîya Xweda de hatine kuştin re nebêjin "mirî"; na, ewan sax in, lêbelê hûn vê îdrak nakin.

155- Muheqeq ku Em ê bi hinek tîrs û birçitî û noq-saniya mal û can û seme-reyan we biceribînin. Miz-gîniyê bide se-birmendan.

156- Ewên ku wextê ku musîbetek tête serê wan, dibêjin: "Em, ên Xweda ne û Em ê vegerin bi Wî."

157- Bexşayî û mihrîba-niya Rebbê wan li ser wan e û yên ku gehîştine hîda-yetê jî ew in.

158- Muheqeq ku 'Sefa' û 'Merwe' îşaretin ji îşar-etên Xweda ne. Loma yê ku Malê (:Kabê) hec dike, yan Ûmre dike, ko van du cihan tewaf bike, ti guneh jê re nîne. Kî xêrekê ji dil bike (bila bizanibe ku) Xweda ecrê spasê dide û zana ye.

159- Yên ku delîlên rew-şen ên ku Me nazil kiriye û hîdayeta ku Me di kitêbê de ji mirovan re îzah û şî-rove kiriye diveşêrin; han li wan him Xweda lanet dike û him jî lanetkerên din.

160- Lêbelê ji bil yên ku tewbe kir in û xwe rast kir in (û heqîqetê) beyan kir in; Ez tewba van qebûl di-kim. Ez tewbeqebûlvan û dilovan im.

161- Bê şik, yên ku bû-ne kafir û (di wê kufra xwe de) mirine; laneta Xweda û melekên û hemû mirovan li ser wan e.

162- Tê de (:di cehe-nemê de) ebedî ne; ezaba wan naye sivikkirin û bi

wan hengamek jî muhlet naye dan.

163- Xwedayê we, Xwe-dayeke yek û yekane ye; ji bil Wî, ti Xwedayek din ti-neye; mihrîban û dilovan e Ew.

164- Di afirandin û xuli-qandina azmanan û zemîn, û di îxtûlafa şev û rojê, û di keştîyên ku bi barên sûd-dar ji mirovan re di behrê de ajne dikin, û di ava ku Xweda ji azman tîne xarê û pê erda mirî jîndar dike û pê hemû jîndaran bijîn di-ke û didomîne, û di here-keta bayan, û di ewrên ku di nava azman û zemîn de emirberane diçin û tèn de, ji qewmê ku difikirin û ra-man dikin re îbret û delîlin hene.

165- Di nav mirovan de hinin hene ku ji bil Xweda, şîrîk û hevpayan digrin û ji wan mîna Xweda hez di-kin. Lêbelê yên ku îman anîne ji Xweda zêdetir hez dikin. Ewên zalim wextê ku ezabê bibînin wê fam bikin ku hemû quwet û qudret yê Xweda ye û eza-ba Xweda pirr bi şidet e.

166- Hengama ku eza-

bê bi çavê xwe bibînin, wê yên ferman-dar û rê-ber ji ferman-ber û tabiên xwe birevin û dûr bikevin û wê hemû pê-bend û munasebetên nav wan de biqetin û perçe bibin.


167- (Wî wextî) wê yên ferman-ber û tabî bibêjin: "He-ger bi me fir-sendek din hatibane dan (ku em vege-rin dinyayê) weke ku ew ji me dûr di-bin, em ê jî ji wan xwe dûr bigirtane." Xweda wê

wisa hemû kar û emelê wan bike sedema hesretê û ew wê ji agir neyin derxistin.

168- Ey mirovno! Ji tiştên helal û pak ên ser-zemînê bixwin û li pey şey-tan merin û wî taqîb me-kin. Lewra ew dijminê eş-kere yê we ye.

169- Ew li we bi tenê neqencî û rezîltiyê ferman dike û dixwaze ku hûn di heqê Xweda de tiştên ku hûn fam nakin û nizanin, bibêjin.

170- Çi wextî ji wan re



bête gotin: "Bibin tabiê tiştên ku Xweda nazil kiriye", dibêjin: "Na, em ê di rêya bav û bapîrê xwe de bimeşin (me wan çawa dîtibe, em ê jî weke wan bijîn)." Ma ko bav û bapîrê wan bêaqil û şaş bin jî (wê bidin dûv wan)?

171- Mîsala kafiran mîna (heywanî) yê ku tiştê jê re tete gotin, fam nake û ji bil qîreqîrê ti tiştî nabhîse ye. Ewan kerr in, lal in, kor in; loma ti tiştî fam nakin.

172- Ey mîminno! Ji tiştê pak û pakîze yên ku Me ji we re kiriye rizq, bixwin û

heger hûn ji Xweda re per-ristiyê dikin, naxwe ji Wî re tenê spasê bikin.

173- Ew li we (goştê) mirî (:laş) û xwîn û goştê xenzîr û hey-wanê ku li ser ji bil navê Xweda navek din hatiye xwendin (û bi vî awayî hatiye ser-jêkirin) he-ram kiriye. Lêbelê kesê ku naçar bi-mîne, bi şertê ku ji hed ne-bihurê û pê nemayil be (ko bi qasî îhtiyaca xwe jê bixwe) jê re ti guneh ti-

neye. Muheqeq ku Xweda xefûr û rehîm e.

174- Yên ku tiştê ku Xweda di kitêbê de nazil kiriye diveşêrin, da ku ji vê riyê menfaetîne cûzî bi-dest bînin, ew zikê xwe bi agir têt dikin. Xweda roja qiyametê bi wan re nape-yive, wan pak nake û eza-beke elîm ji wan re heye.

175- Ewan hîdayetê dane û pê dalalet û şaşîtiyê kirîne, bexşîtî û ewfê dane û pê ezabê kirîne. Çi tişt li ber agir (ê cehenemê) se-b-ra wan tîne?



# SÊWIYÊN UMMETÊ

ABDULLAH PINAR

**L**i rojhilata navîn gelê Kurd jiyana xwe dom dike. Lê hema bi çi halî? Bi bindestî, bi xizanî û bi bêkesî... Ji bo vê yekê Gelê Kurd sêwî ye. Sêwiyê ometê ne. Îcar çi fêde omet ji jê re pişt dernakeve...

Kurdan berê Îslamiyetê ji û pê Îslamiyetê ji ti caran serê xwe li ber kesî xar nekiri ne. Her dem li çiyayên xwe, li deştên xwe, bi serê xwe bûne. Neyâra, ji vê re tehemul nekiri û Kurd di halê xwe de nehiştin...

Ji Wexta Hz. Ömer de (r.a.), Kurdan Îslamiyet bi riza dilê xwe qebûl kirin. Îslamiyet qebûl kirin şûnde bûn şûrê Îslamiyetê. Armanca wan bû Îslamiyet, xewna wan bû Îslamiyet. Canê xwe, malê xwe di vê rê de feda kirin. Li ber fileha û cihuya weka şêran sekinîn... Ji nav Kurdan pirr zana û, rêber û mêrxas derketin: Kalê Selahaddin ji ji vanan yekê. Wi ji tirsek mezin da cihu û filehan. Lingên wan ji erd û welatê mislimanan birrî. Tirsê cihu û filehan heta vê rojê ji dom kir. Û ji vê tirsê Kurdistanê perçe perçe kirin û gelê Kurd, li pênc welatan belav kirin. Di vê dewrê de jî, ji nav Kurdan îcar Şex Seîd û Seîdê Kurdi derket in. Wan jî, bo

gelê xwe, bo armanca xwe, heta dawiyê omrên xwe micadela xwe dom kirin.

Armanca Kurda ti car nebû nijadperestî. Armanca wan her dem Îslamiyet bû. Ji bo vê yekê jî, ket in bindestiyê. Emperyalîsta nedixwestin ku Kurd bi serkevin. Ger Kurd bi ser xwe bin vê zordestiyê û zilmê qebûl nakin. Ger Kurd bi serkevin, kes nikare petrola Kurdistanê bidize. Îcar çi fêde Kurd îro ne bi serê xwene. Îro jî Kurd di bindestiyê de ne, îro perîşan, îro bêkese, îro tenêye û îro sêwîye... Zimanê Kurd qedexeyê, Kurdistanê perçe perçeyê. Navê Kurdistanê wenda ye, zarokên Kurdan sêwîne, jinên Kurdan bîne. Mêrên Kurdan stuxarin...

Zilma hatiyê serê gelê Kurd, nehatiyê serê ti gelan. Kurd geh li Iraqê sirgûn bûne, hatine kuştin, geh li Îranê, geh li Rusyayê, geh li Suriyê û li Tirkîyê. Ê ku va zilman anîne serê wan jî birayê wan in. Li Dersimê, li Zilanê, li Amedê, li Helepçê, li Mehabadê, li Laçînê Kurd qetil bûne û dibin. Car Nemrut, car Dehhak, car Kemo, car jî Seddam bûn neyarên Kurdan. Em yeqinin, wê dîsa ji Kurdistanê, Kalê Selahaddin, Şex Seîd ewe derkevin. Ew wê

dîsa li hember zilmê bisekinin...

Ji bo Kurdan, ji Îslamiyetê dûr kin, ramanên genî kirin nav Kurdan. Va ramanana jî, nijadperestî û çepiyê. Gelê Kurd ji bo Îslamiyetê dîsa li ber xwe dide. Îslamiyetê ti car bernadê. Îro dewletên mijoperest, ji şiyarbûna Kurdan zaf ditirsin. Kurd şiyar bibe ewê heqê xwe bixwazê. Ji bo vêya di wextê de mamoste û zanayên Kurdan kuştin. Medresên wan girtin û nehiştin zanîngehên wan vebin. Zarokê wan aliman iro giş bune şivan û giş li gundan û çiya nezanan. Yê ku ji gelê Kurd, çûn zanîngehên mijoperesta, zimanê xwe jibîrkir, jiyana xwe bi zimanê mijoperesta dom kir. Xwestina mijoperesta ji ev bû...

Li Helepçê, li herba Delav (: Körfez)ê de dijmin bi halê me giriya. Deng ji brayên me derneket. Fileh û cihu bûn xwediyên mafên me. Cardin jî deng ji brayên me derneket. Ji vê yekê; Em êclî ne bende kesine. Emê bi xwe rabin serxwe. Rabûna me ewê Îslamî be, xelasî û rizgariya me tineyê.

Îro em bi zimanê xwe nikarin binivîsîn û bixwînin. Rûreşiyek ji vê ya mezintir jî tineyê.

# HELEBÇE: MIRÊKA ZALIM Û MAZLÛMAN

NACÎ GÛLMEZ

Ji bona ku gotinê me xelet neyin famkirin lazime xwendevanên me kirasekî Helebçeyî li xwe bikin û li xeyela xwe siwar bibin û herin halê Kurdistanê bibînin û heq bidin gotinên me.

Tiştê ku însanan ji xwedîruh û melaykan diqetîne; îmtihana şanoya dinyayê ye. Di vê şanoyê de berdevkên heq û batil li hemberê hev têkoşin dikin. Ev berdevkenên heq û batil ji Habîl û Qabîl virde hatiye û ewê hetanî qiyametê ji dom bika. Dem hatiye şuna Habîl û Qabîl, Musa û Fir'ewn, Îbrahîm û Nemrût, Huseyn û Yezîd, Şex Seîd û Kemal û dem jî hatiye mazlumên Helebçe û Kafirê Sedam girtiye.

Di vê pêvajê têkoşinê a heq û batilê de kêrta dawîn Helebçe û Sedam e. Sedam li hemberê Îranê weka maşê dihat xebitandin. Li piştê wî minafiqên ereban û kafirên Rôva hebûn... Ji ber vî serî li ser Sedam xweş bû û dixwest bibe egîtê Qadîsiya duyem. Lê felek jê re nebû yar û dilxwaza xwe ji Îranê nedît. Ji bona ku textê xwe zexim bigre weka berazê birçî vegeyriya ser mazlumên Helebçe û meslegê Hecacê zalim li ser mazlumên Kurd ceriband.. Pela salnamê 17'ê Adarê nişan di-

da. Xwinxwaran perçekî umetê bidizî didan şewatê. Teyara Mig-21 li ser Helebçe mîna teyrê atmece diçû û dihat û bombên kîmyevî davêt ser Helebçe. Ewrên kîmyeviyên reş mirina bêxwîn ji milletên Helebçe re diçinî. Wan ewrana li şûna baranê agirê bê reng dibarand. Ev agira însan û heywan dişewitand. Neyê jibîr kirin ku Xwede ferman dike "Kî însanekî bê sûc û guneh bikuje wekî însana teva jî bikuje" (Maîde: 32) Cezayê yek însanekî bê guneh bikuje ev be, lê cezayê kuştina bi hezaran însana wê çibe? Ji van însanên dest bi xwîn re kîjan cezayê dinyayê têr dike. Belê însanê bê guneh; wan zarokê ku di kuççan de dileyistin hatin kuştin. Kal û pîrê bê taqet hatin kuştin. Dergûşên ku di hêlkanê de hîna dinya nasnekirin hatin kuştin. Xwedê wê bipirse ku "Gunehê wan dergûşan çibû ku hatin kuştin." (Tekwîr: 8-9). Ev ayetan ji Qur'ana Kerîm, di dewra cahiliyê de ku muşrîkan dergûşê xwe yê keç dikuştin, nazîl bûye. Xwedê ev ayetan nazîl kir û gef dida ehlê kufre. Baweriya me heye ku cahilên ve esrê jî wê nesîbê xwe ji gefa vê ayetê bigrin û wê bibin darê cehenemê.

Di Helebçe de dergûşek ne, bi sedan dergûşên masûm hatin kuştin. Nûçevanê ku resmê wan cenazan dikişandin, xwe zêft nedikirin; dilê wan li hev diket û digiriyan û ev dua ji Xwedê re dikirin. "Ya Reb! Tu qetlîamek wuha carek din ravay me ne kî!" Bi xebata van nûçevanan dinya piştî heftekî bi wehşeta Helebçe dihesiya. Merivan ji hev dipirsîn, sucê vî miletî çi bû? Bersiva wî eve Kurd in û mislimanin. Belê Gelê Kurd bahayê Kurdîtiya xwe bi canê xwe didan. Bi serve jî, navê Kurdan xayînê welat dihat eyan kirin. Erê, zalim mazlûman "xayîn" bidin eyankirin, wê çaxê elamete ku çerxa felekê çep dizîvire. Mesela we gelek filmê Omer Muxtar sêr kiriye. Ku li himberê Îtalyan ji bona xilasiya welatê xwe têkoşinek bi şeref derbasî rupelên dîrokê kir. Dema hat girtin di mehkemê de hakim û sawciyên Îtalyan qirara xayîniyê ji bona Omer Muxtar didan. Meriv bipirse; Gelo Omer Muxtar çûbû li ser erdê Romayê bi Îtalyayîyan re têkoşin dikir? Naxêr! Omer Muxtar li ser erdê bav û kalê xwe li hemberê xwînmijan, ji bona dîn û namûs û erdên xwe, têkoşin dikir. Sala 88' de hakim û sawciyên Sedam



ketibûn şûna yê Italian û mazlûmên Helebçê jî ketibûn şûna Omer Muxtar. Dema ku di mehkemê de hakim karê sawcî bibîne, ka mahkûm wê derdê xwe ji kî re bibêje? Mahkûmên Helebçê dema li xwe varqilîn û ji xwe pirsîn: kînin em? Wê demê qerara mehkemê ev bû: Vana xayinên welat in. Kesên bi revî revî ji qetlîama Helebçê xilas bûn û ber bi Îran û Tirkîyê hatin. Dema hatin tixubê Tirkîyê, serwezîre Tirkîyê wê çaxê Ozal bû. Bi ciwamêrtî û bi siyasetek baş Gelê Kurd girte Tirkîyê. Ger ku li ber vê qetlîamê bêdeng bima, ew jî wê çaxê alîkarê Sedam dihat qebûlîkirin. Hinek Kemalîstên Çaplus ji hatina kurdan eciz dibûn û wuha digotin: "Têkilkirina pirsgirêka kurdan, ji têkilkirina agir zortir e" (Ugur Mumcu) "Gelê Kurd ne hem-nijadê me ne û ne jî birayê me ne" (Coşkun Kırca), "Tirkîye

ya Tirka ye" (Oktay Ekşi).

Van şexsên qelem qirêj çima wuha digotin? Sebebê vê du tişt in: Yek, Kurdên Tirkîyê jî ewê Helebçên M. Kemal bên bîra wan û hişyar bin. Yek jî: Pawenda pirsgirêkê digîhişt Îranê. Hal wuha be ji van çaplûsan êdî çî dihat hêvîkirin. Ew kesên ku şîrovê wuha dikirin dem bi dem qala hesîrên Tirkên li Rusya dikirin. û Tirkên li Kerkûkê û Ozbekên li Efxanîstanê û Tirkên li Bulxarîstanê jî zîmanê xwe nedixistin. Di nezera wan de serekê Tirkên li Qirimê M. Cemiloglu û jî Bulxarîstanê N. Suleymanoglu her yek weke egîta nin. Dema ku dor were xelkê xerîb û ku Tirk nebin û bi gorî mantiqa wan laîqê destmaçkirinê bin jî, wan kesê çaplûs rihet dikarin bibêjin vana "Xaîn in." Wan kesê ku mora xaîniyê di destê wan de û muxtariya xaînan dikirin, dizanin ku ev

Helebçe ne a pêşî ye û ne jî a dawî ye. Ev derdê di canê mazlûmên Helebçê de di canê Seyid Elî û Yûsif Ziya û Şêx Seîd de hebû. Dizanibûn ev xaîntî bi mazlûmên Dersimê û Koçgirî û Agirî û Gelyên Zîlan de hebû. Ji bona vê teşqele dikirin û mora muxtariya xaîniyê ji destên xwe danetanîn. Me wuha bawer kiriye ku têkoşîna zalim û mazlûma ewê hetanî qiyametê dom bike. Lê gereke ev neyê jibîrkirin: ger netewek bê îrada xwe di binê bandora netewekî dinde be mafê wan mazlûman ê tabîi ewe ku ji bona azadî û têkoşîna xwe cehd û xebatê bikin.

Di îslamê de jî heye ku dewrên fetretê de (dewra ku xelîfê îslamê tine be) her millet dikare ku bi xwe, xwe îdarê bike. Bi mîsaqên milî kes nayê girêdan. Misaqên milî weke çarix û gore, her wext mirov dikare biguhere.

# PÊNC HEZAR KULÎLK

SÜLEYMAN ÇEVİK

**D**i dîroka însaniyetê de çekên kîmyayî carinan di cengan de bi destên hinek dewletan hatiye bikaranin. Mese-la li Wîetnamê, cenga Iraq û Îranê de, berî van jî Cenga Cihaniya Duyem de pîr cara behsa çekên kîmyayî bûye. Di van cengan de pîr nîşan hene ku çekên kîmyayî hatine bikaranîn.

Çi wext, ez li ser qetlîama Helebçê nivîseke dixwînim û difikirim, yan jî helbesteke û peyveke guhdarî dikim, mirovên bê guneh û kuştîyên mazlûm li ber çavên min rêz dibin. Bajarekî bi mij û duman mîna filmekî hêdî hêdî bi min xuya dibe. Dîsa ruhê min şîn dike, li jiyana min xemgînî dibare.

Li Helebçê 16-17 ê Adarê, sala 1988 an de zêdetirî pênc hezar zar û zêçik, jin û mêr, kal û nevî, xuşk û bira, bûk û zavayên bê guneh, tev bi çekên kîmyayî di nav gazên xerdel û siyanûr de, bê nefes man û fetisîn... Bê birîn û bê xwîn...

Li rûyê erdê mîna vê qetlîamê ti qetlîam biqasî ku

ez zanim tinene. Ji vê sebebê ev qetlîam bê emsal e.

\*\*\*

Zilma Sedam li ser Kurda bi Helebçê dest pê nekir û bi Helebçê jî neqediya. Berê Helebçê jî, piştî Helebçê Kurd bi metodên derê însaniyetê hatine kuştin. Hem berê cenga Iraq û Îranê, hem jî dema ku ceng dom dikir li ser Kurdan zilm û zorî tew kêmbûye.

Meha Tîrmehê, sala 1988 an de dema ku Iraq û Îranê agir rawestandî, Iraq bi teva hêzên xwe veşartî ser Kurdan. Bi her cure çekan û çekên kîmyayî êrîşî ser Kurdan kir. Bi sed hezaran Kurdên jar û perîşan bi hezaran miriyê xwe û mal û milkên xwe cih de hiştin, bo canê xwe xelaskin bi çiyayê ketin û reviyayî Tirkîyê û Îranê.

Ji vê zilmê re dinya bêdeng ma. Sed car heyf ku dewletên misliman jî bêdeng man. Bi bêdengi-ya xwe jî neman. Ser de jî zilma Sedam veşartin. Di weşanên xwe de behs nekirin û ji bo ku Kurdan ji vê

mazlûmîyetê xelas bikin ti cehd û xebatên xwe nîşan nedan. Tirkîyê jî wê demê raporek da. Di rapora xwe de li ser Kurdan bikaranîna çekên kîmyayî înkâr dikir. Ev înkara dihat hesabê hemû emperyalîstan jî. Lewra menfaeta Sedam û ya wan dewletan wê dewrê de lihev dihat.


Kurdan dîsa dîtin ku tenêne û bê xwedîne. He-ger dewletên ji wan re xwedî derkevin hebûna, ev zilma nedihat serê wan. Piştî ev zilma hat serê wan jî zilm bê cewab nedima.

Çi wext Sedam Kuweyt îşxal kir û derbek di menfaetên wan xist, wê wextê zilma Sedam hat bîra emperyalîstan û çekên kîmyayî jî ket rojeva wan. Tirkîyê jî di telewîzyonên xwe de cara sifte ji qetlîama Helebçê û ji çekên kîmyayî evqas behs dikir.

\*\*\*

Li Helebça wêrankirî de însan tenê nemirin. Bi pênc hezar can re, nebat û heywan mirin, giya û kulîlk, tay û kevok mirin.

Beybûn û benefş, gul û sosin stûyên xwe xar kirin



û ji jehrê çilmisîn. Daran pel û keskayiya xwe weşandin rût û repal man. Tiştên bican û tiştên bêcan, teva xwe bi reş ve veşart. Rengên spî, zer, kesk, sor û pembe yek bi yek rengên xwe guherandin, hemûyan reş girêdan.

Ewr jî bi baranê ketin nav şîna mazlûmên Helebçê. Bû şîrçe şîrqa wan û xwe kirin şîrkê êşa xelkê Helebçê. Bi baranê hêsrê xwe barandin. Ji bo roja azadiyê û serfiraziyê bi hêsrên xwe pênc hezar kulîlkên Helebçê av dan.

Kew û bilbilan dengên xwe yê xweş sekinandin. Kewan xwe di çiyên de,

bilbilan jî xwe di hêlînên xwe de hepis kirin û xeber dan heval û hogirên xwe ku ew jî werin serxweşiya xelkê Helebçê.

\*\*\*

Jehr li bajarê Helebçê bariya. Mijeke tarî bajarê Helebçê ji jor de kir hambêza xwe. Helepçe jehrî bû. Wî mijî ne baran barand, ne jî berf anî. Ji jor jehr bariya, zar û zêçik weka berxan can dan. Zarokên ku hê nizanîbûn zaroktî çîye, lîstik çîye. Hê nizanîbûn jiyên çîma ji wan re tim û tim xemgîniyê dibarîne.

Di demeke kin de, bi vê jehrê mirovên masûm tev

fetisîn. Roja 16 - 17 Adarê sala 1988 an de, pênc roj berî newrozê di axa welatê xwe de, pênc hezar mirov bûn kulîlkên newrozê. Pênc hezar can; pênc hezar kulîlk...

Helebçê de îro jiyên dom dike. Kulîlkên ku wê rojê di axê de qurs dan, mezin bûn, bûne şîtil. Rabûn piya li ser lingên xwe bervî azadî û serfiraziyê gav bi gav dimeşin. Li ber wan astengeyên pîrr mezin hebîn jî... Jiyên li Helebçê îro bi meclîs û parlamentoya Kurdistan xemilî ye. Şehîdên Helebçê azadî û serxwebûnê diyarî xelkê xwe dikin.

# HELEBÇE

## EM TE JIBÎR NAKIN


MUSTAFA YILDIZ

Sal 1988; 17e Adarê; dîrok dîsa Li Kurdistan ê xwe nûber kir: Wekî Dersim, wekî Palo, Mahabat û Agirî. Îro jî li bajarê Helebçe. Rejîma Iraqê, bi seroktiya Seddam Hüseyin, li ser gelê Kurd, ku bê kesin, bê xwedî û bê welatin. Wekî sewîyê miletê mislimanin. Li

ser wan bi jehra Xerdelê û siyanorê agir barandin: Zarok û zêç, dayik û bav, kal û pîr, li gor xerên ajansan 5000 mirov (hê bêtir) teva heywan û teyr û

tûya hate qelandin. Kîjan wicdan li ber vê zilmê û xwînxwariyê zexm dimîne? Ko filebin, ko cihû bin, ko bê dîn bin belkî dîsa wisa nekin. Wekî Filistîniyên ku leşkerê Îsrail wan kevir dikin û carina birîndar, carina dikijun. Dîsa jî leşkerên cihuyan sere çend

rojan, çendek ji gelê Filistîniyan birîndar dikin yan dikujin: Lê Seddam û merovên wî bi carekê de karin bi hezaran merova bikujin û bişewtînin. Va zilma ku nayê tarîfkirin; Westê tê bîra mirovan, wekî bizotek agir tê danîn ser kezeba mirovan. Bê hemd hêstir



ji çavê mirovan dirijin. Li hember vê zilma mezin, ti kesî ev zilm neanî ser zimanê xwe û êrîş nekirin. Di rojname û kovarên xwe de ne nivîsandin. Nalet li Seddam û rejîma wî û yaranên wî neanîn. Kû mirov rast misliman be, rast şerîetvan be, yên ku li bajarê He-

lebçe hatin kuştin ne file û cihû bûn; bi çavê min ew jî misliman bûn, hem jî ji gelekan baştir misliman bûn. Çawa ku zanakî wisa gotiye dîndariya Kurdistanê li hemû dinya tine. Erê rast gotiye. Dîsa jî ti deng ji kesi (Tırka, Ereba, Farisa hwd.) nehat. Va men-

zera lazime ji ge l ê Kurd re b i b e dersek mezin û îbretê. De ma ku li Bulgarîstanê nave hinek Tirk hatin guhertin, hinek li w a n zilm bû, d i n y a rakirin

ser piya gotin di vê esra 20 an de, ku dike têkeve esra 21an ma zilmeka wisa mezin dibe? Qey jibîr kirin di hêjmar 1985 an de li gor qeyda resmî 20.000.000 Kurd (niha hê bêtir e) navê wan hate guhertin û car caran hatin kuştin kû hê tene kuştin, ma va ne

zilme? Çima ku Kurd bê hikûmet û bê xwedî bûn. Mîna ku li zikê mirovekî xistin mirov got: "ax piştamin." Dijminê wi gotin "Me li zike te xist tu çima dibêjî ax pišta min?" Mirov wisa bersiv dide: "Ku piştamin hebûya ma we dikarîbû li zikê min xista?" Li me jî wisa bû. Heger hinek misliman wisa kir, em jî wisa fam dikin ku vana Îslamîyetê ji dawa xwe ya nijadperestiyê re dikin perde û sîper. Ko ne wisaye, li her derê dinyayê milletên mezlûm û yên misliman, kî dibe bila bibe, misliman yan ne misliman, ji kîjan milletî dibe bila bibe, lazime em li hember zilmê çî ji destên mirovan were li ser mislimanan wezîfeye ku bike. Wek ku qasidê Xwedê (selat û selama Xweda li ser be) Weha gotiye: "Li hember zilmê û xirabiyê yan bi destên xwe, yan bi zimanê xwe derkeve. Heger nebû bi qelbê xwe buxzê bike. A paşin, yanî buxzkirin, noqteya imanê ya tewr zêf e. Ko va jî tinebe ne-ûzubîllah ew talukê de ye, bira ji îmana xwe bitirse."

Ey gelê Kurdan! lazime em di seriatê de xizmeta milletê xwe bikin û ji bona azadiya axîret û dinya gelê Kurd bixebitin. Li me ferze ku em xizmeta milletê xwe yê mezlûm bikin ku bona azad û serfirazbin; Çawa mela Seid ê Kurdî gotiye "Ez bê non dijim, bê azadî najîm." Lazime ku em jî Kemalîzmê teva Îslamê nekin, bila bişkê deste zilmê, bila xirab bibe mala xirabiyê. Înşallah bi destê me wê koledarî û zordestî rabe. Emê bişkînin destê zalima, xwînxwara û mijokdara. Emê xirab bikin mala xirabiyê; bi destûra Xwedê û bi qeweta Yek ê Tenê.

Wesiyeta paşin: weka mela Seid ê Kurdî; "xwendin, xwendin, xwendin. Dest hev girtin, dest hev girtin, dest hev girtin."

## NO MERGÊ ÇENDYO?

*-qendê şehîdandê Helebçey-*

Ax welato bêkes!  
Namerdena to a çendina?  
Sersey a to ra jî gûnî rijyena linga bin.  
Ya qeçê werdî...  
Ûyê kiyenê mayandê xo virardi.  
May û pî gûnî virêjenê meyîtê qeçandê xu ser  
Qîriya ci siya heleynena siyaser  
Finajî  
nîno merhemet dişmeno bênamûs.

Ax welato bê wayir!  
Qandê çiçî jiyahi to di hend ercaneye?  
Heme cayê to ra boy a mergî vilabena.  
Hewrê siyay to sero geyrenê  
Nê birûskiyê şîrquenê. / topu gulleyê varenê  
Qiyameto! / cehnîm viraziyayo no dunya di marê  
Çirê mayê mirenê zey wel û hera.

Ax welato mazlûm!  
Rehet niyo herg roj gandayîş  
Jew ti zanê, jew jî ez  
No çî hato mayê teydi?  
Çirê ma qewiryenê her kêberî ra.

Ax welato bindest!  
Kamcîn dîroger camêrdo  
Binîvso dirbetanê to yê helakî?  
Kamcîn Ressay wetano bineqîşo  
Derd û kulanê to bimisno dunyay û alemî.

Ax welat! Ax!  
Ka Rustem'na kotî mend? De veji!  
Hêsrî ma çimandi nêmendî, gûnî qedye  
Mayê gana vero  
Ma şekerê? Sera şîrê?  
Jew sî nêbena sitare ma rê?  
Ma famkerdo nika  
Reyayîş çinyo bê xebatî!

Abdullah Alper

# QABILIYETÊN QURMIÇÎ YAN JÎ HELEBÇE

## ELÎ KARADENİZ

**B**erî nuha bi pênc sala jiyaneke hate qurmiçandin!

Zalima bi wahşîtiyeke mezin; bi bombên xerdelê, bajarê Helebçe kirin goristan. Çi xemnak e, ku ne jiyana Kurdan mîna ya xelkê ye û ne jî mirina wan...

Welatê me, bûye warê lorînê. Her ku me lorand mirin zêdetir bû. Lorînên me ti carî merhemet û şefeqetê di dilê zaliman de hêşîn nekirin. Lanetên ku li zalima hate barandin jî, wan ji text û serayan ne anîn xar. Erê, hê jî zalim li ser lingane...


Gelo zordesta bi çi awayî rê ji ber Kurdan girtin? Ev şeva reş û

dirêj bi kîja zanetiyê anîn serê Kurdan? Bersivên van pirsan bikifş in, lebelê ez dixwazim bibêjim; rewşa îro ku Kurd tê de ne, sedemê wê tenê ne zordest û xwînmij in. Bi baweriya min, em bi xwe, yanê Kurd bi xwe jî

bûne sedemê vê talanê. Ma mumkin e ku tev berxwedan û têkoşîna me, dijmin tenê bi fen û fûta, lingên me ji ber me kişandibe û em wisa belengaz û reben hiştibe? 'Me ti kes ne xapandine' lê

Pirseka wisa encax bi zalima dikeve; lêbelê zalim jî li halê rehetî nikarin tiştêkî wisa bibêjin. Ma diwêrin bibêjin "roj tine ye". Derwek wisa, kesen ku çavên wan girtî ne, yan jî ên ku hîç rojê nasna-

kin dibe ku jê bawerkin. Lêbelê mirovên ku rojê nasdikin, dizanin ku 'sibeh nêzîk e' û ewê roj bi ser zilmê de hilê. Naxwê ev cesaret û hêwira dijmin ji çi tetê der, ku dikarin bibêjin "Kurd tine ne?" Dikarin, lewra ko em hebin, ka em li ku ne? Lewra hebûn tenê ne bi pîrbûna nufûsê ye. Zêdetirîn, xebat û şop û eserên gel e, ên ku hebûna gel dide ni-



ku em hatibin xapandin muheqeq ji nezanbûna me ye.

Heger na, ma ji bona çi ên mirî tim emê buna? Dev ji warşewitandin û koçberkirin û qirkirina me berdîn, ma 'hebûn' û 'nebûn'a me dike te mazatê! Gelo Kurd henin?

şan. De ka em ji xwe pirsbin: Ka çand û huner û tarîx û edebiyata Kurdan? Ka rojname û kovarên Kurdan? Ka zana û ronakbîrên ku bi navê gelê Kurd têne naskirin û rûmet dibînin?..

Naxwê dive ku em hebû-



na xwe îspat bikin; hebûnek mîna tavê bi rohnî... Ev toqa nezaniyê, toqa koletiyê lazîm e ku em ji histuyê xwe derxin û xwe jê xelaskin. Bila kedxwar wê cesaretê nebînîn ku bibêjin: "Heger ne em bin ewê Kurd hevûdû bikujin."

Rabin û bêhneke nû bikşînin. Ev axa ku Kurd lê dijîn medeniyetek wisa mezin kirî ye ku ji Kurdan pê ve îro herkesî para xwe jê girtî ye. Gereke me fam kiribe ku ev ax, rawestîne hez nake, naxwe Kurd li hevî ya çî ne?

Qirkirina Helebçe, mîna hemû êrişên ku li Kurdan bûye, bi niyeta qurmiçandin û hişkirina bîr û qabiliyeten me ye. Li hember ewqas êrişên dijwar, bi yekcarî em ji dest ketin. Xelkekî şaş û reben û bêxwedî... Nezanî û reşayî çavên me kor kir û me bi destpelîne jiyane didomand.

Hasil, ev reşayiya, helbet ewil ji Kurdan re, lêbelê ji hemû gelên herêmê re rûreştîyek mezin e. Em gazî dikin wan jî, lazîm êdî bes bibin piyonên serokên xwe yê xwînmij û zordest. Bila werin û em hemû bihev re koka zilmê û zalîma rakin.

Gereke ev gelan jî zanibin ku, jiyana Kurdan lufî Xwedî yê Aleman e û ti kesî bi deyn nedaye wan ku doza vî deynî ji Kurdan bikin.

Kurdno, heta îro bi vê bêdengbûna xwe, em bi xwe jî bûnîn qatîlên xwe. Divê em qenc nasbikin ku, heta em ji xew ranebin, roj bi ser me de hilnayê. Çavên xwe vekin û tavê bibînîn û bibin mîna tavê.

## KÎ AŞITÎ NAXWAZE!..

-Êdî navê Filît bûbû  
"Barîş Duşmanî".-

**M**amo Hesen ji ser ban qîr da birayê xwe.

Birayê wî Filît li jêr bi berfîkê rê divekir. Îsal pîrr berf barîbû. Mamo Hesen berfa ser ban dixeritand, birayê wî jî berfa ber derî.

Mamo Hesen qîr da:

— "Filît!"

Filît serê xwe rakir û li kekê xwe mêze kir, lê ti tiştî negot, ne got "çî ye?" jî.

Mamo Hesen got:

— "Vê sibê radyoyê got, ku..."

Û li derdorê xwe mêzîkir, ka kes li wan guhdar e yan na, kes dengê wî dibhîse yan na. Filît çavê wî hê li jor, çena xwe spartibû destiyê berfîkê û li kekê xwe mêze dikir.

Mamo Hesen dom kir:

— "Erê lo, radyoyê got, ku: kurd 'barîş' naxwazin bi tirkan re. Lê ka ji min re bibêje, ma ev 'barîş' çî ye?"

Çavên Filît vebûn, mîna çavên ga... Her du destên xwe yê qefilî tev da, piçkî germ kir û got:

— "Kî barîş naxwaze!.. Ez ê dil..."

Wê xeber bida, lê şerm kir. Serê xwe berada ber xwe û ponijî.

— "Filît, barîş çî ye?" got dîsa Mamo Hesen.

— "Barîş, bir tirkî yanê aşitî. Tirk dibêjin, kurd aşitî naxwazin. Meqseda wan ev e. Û va min jî da xebara. Kî aşitî naxwaze, ez ê!..."

\*\*\*

Dem bû bihar, leşkerê tirk hatin Filît birin.  
Êdî navê Filît bûbû "Barîş Duşmanî".

Bager

## KEÇA PIÇÛK

A li derî dide ezim  
Li deriyan yekî b'yekî  
Ez li çava xwiya nabim  
Xwiya nabe l'çava mirî

Ez li Hîroşîma mirim  
Berî nuha bi deh sala  
Hê'z keçeke heft salî me  
Mezin nabe keça mirî

Pêşî pora mi şewitî  
Çavê ni hişk bûn kizirîn  
Ez bûme gemşeke xwelî  
Xwelya mi bi hewa firî

Ez ji we j'bona şexsê xwe  
Eslen naxwazim tişteki  
Şekir jî nikare bixwe  
Zarwa wek kaxez şewitî

Ez li deriyê we didim  
Xaltî apo înzak bide  
Bila zarok neyin kuştin  
Û bila bixwin şekir jî

**Nazim Hikmet**  
*Ji Tirkî: Hozan Oflaz*

**nûbihar**

**BIXWÎN**

**BIDE XWENDIN**

**Û ABONEYAN**

**JÊ RE PEYDA BIKE**

## MEDRESA HORHOR

Rojekî ez Wanê bûm  
Ji bo nimêja sibê ez ji xew rabûm  
Min nimêj kir dawî ez ketim xema  
Hêstirên zelal çavê min herikîn weka çema  
Xiyala min barkir çû dîroka wêran  
Ez rabûm meşyam, min berê xwe da kela  
Wan  
Ez hilkişyam serê kela kal  
Ez xemgîn ez dertmend û pîrr bê hal  
Roj hêdî hêdî bilind dibe  
Şeva reş diçe dem dibe sibe  
Sîpanê xelatê berçav eyan e  
Çiyayê erekta qebqeba kewan e  
Ez rûniştim min behr mêzekir  
Min qewl û keser û xemên xwe der kir  
Medresa Horhor kete bîra min  
Dilê min şewitî bû zarîna min  
Ez serejêr bûm çûm medresê de  
Ne Seîd ê Kurdî ne feqiyên wî ti kes tinebûn  
tê de  
Ax felek! ax felek!  
Ka ew seydayê xencer belek  
Mi got medresê medresa Bedîuzeman î  
Tu dewrekî hêlîna feqan î  
Ezê ramûsim diwarê te ji bo xatira melayê  
meşhûr  
Mele bîdim bîra xwe hêstira rêzîm hûr hûr  
Medresa dilê minê xemhîlgirda pîrr birûmet  
Warê cûdabûnê ye ev dinyaya fanî û bêrûmet  
Ê wey min û te evinê cûda ne yek in ne  
hazar  
Ne kêmin ê ku ji agirê cûdabûnê kezêb  
dişevitin û dikin zarzar  
Hey medresa şîrikê derdê min  
Warê Seîd ê Kurdî yê seydayê min  
Qedera Rebbê ezêlî wisa ye  
Mirov vê dinya han de her tim miraza çî de  
ye

**M. Şakir ê Koçer**

# BIRÎNA XEDAR

## ELÎ HÎKMET TEKÎN

“Pirsgirêka Kurdan” li ba min pirsgirêkeke dîrokî û neteweyî ye. Şaxên wê yê aborî, erdnigarî, polîtîkî jî hene. Bi kurtasî, bingeh û sedemên vê pirsgirêkê ev in:

Ev pirsgirêk ta ji sedsala panzdehemîn û şûn de hebû ye, lê ne bi awayî û qasî. Lê piştî sedsala nozdehemîn, welatê Kurdan di nava çar mijokdar û dagirkeran de bi hevkarî û alîkariya emperyalîstan ve tê parekirin û perçekirin. Kurd di welatê xwe de dibin dîl û mi-hacir. Zimanê wan, çanda wan, dîroka wan, bi kurtî her çî tiştê ko têkiliya wê bi kurdbûnê va hebe tete windakirin, qedexekirin. Qeflê li zimanê kurdan dixin. Navên her tiştî (çol, çiya, berî, kanî, mirov, dar, ber, giya..) tete guherandin. Paşa Beg, soz û bextê ku dabû Kurdan ji bîr dike, înkâr dike. Û komplo, provakasyon, asîmilasyon, şken-ce, zilm û zor, tade, koçberîkirin û her wisa metodên dijmirovahiyê li ser Kurdan tê ceribandin.

Ji bo ko Kurd şiyar nebin, ji her alî ve (aborî, zanyarî,

jindarî... hwd) bi qesî li paş tîn hiştin. Kurd hov ten nîşandan, warê wan ji bo karmendan dibe cihê koçberkirinê.

Li ser Kurdan herdem û vê gavê jî polîtîka û metodên durûtî, xapandinê û li ser vê bingehê zilm, şken-ce, windakirin û tinekirinê tîn meşandun. Ji aliyek Kurd û Kurdistan tine û winda dikin, ji aliyê din ji heyyên sererd û binerdê Kurdistan û çand û hunera Kurdan îstîfade û asîmîle dikin. Ji alîkî ve “Kurd - Tirk bira ne”, “bû hezar sal em tev de dijîn”, lê aliyê din xêr û bêr li wan, kevir û kuçik li Kurdan, ango çî tiştê li dijî mirovahiyê, biratiyê, rastiye, heqiyê hebe li Kurdan dikin, hê jî dikin.

Her car ji nezanî, xizanî û îxtîlafê nav Kurdan îstîfade dikin. Kurd bi Kurd didin kuştin. Bersiva mafek piçûktirîn, girgirîn û koçberkirin didin. Ji bo ku karibin her tim Kurdan wisa bicmilînin; serok, rêber, zana, rewşenbîr (mela, nivîsker, mamosta.. hwd.) yên Kurd carinan bi eşkere, carinan jî bi komplo û provakasyonan winda dikin. Ji ber vê ye bi-

rîna Kurdan pîrr xedar e, pîrr kûr e.

Kurd her dem bi Teqrîrî Sikûn, bi rêvebiriyê taybetî, bi biryarnameyan, bir girgirinan, jenosîdan... tîn îdarekirin. Ji bo Kurdan lêbelê mafê mirovan, siya mafê mirovan jî tine.

Ji bo Kurdan xwe înkarkirin bûye mecbûriyet. Eger xwe înkâr neke jiyan jêre nîne. Kar jê re nine.

Kurd gava doza mafê xwe bike, li mafê xwe bipirse, wê gavê navê wî dibe: Eşqiya, sergerdan, çapulcî, terorîst, nezan, file, kafir û hwd. Cihê wî jî yan binêrdê ye, yan jî heps û zindan e, sêpê ye.

Helbet di rewşek wisa de bê pirsgirêk çênabe û tiştê tê xuyanê birîna xedar, xedartir dibe.

\*\*\*

Ji bo hel û fesilkirina vê pirsgirêkê pêşniyarê min:

Ji Kurdan re: Xwendin (zanyarî), desthevgirtin û xebat.

Ji zordar û zordestan re jî: Kufir dewam bike jî zulm dewam nake.

Heger bawer nakin bila li paşîya Fir’ewnan, Nemrûdan û Dehakan binêrin.

# ÎSLAM Û JIN

## ZEYNEB AMED

**G**elî xuşkê min ên delal û bi rûmet. Xwedê hezbike, emê di îslamê de li ser mafên jinan mijûl bibin. Ka di îslamê de, cihê jinan heye yan na? Îslam rûmetê dide jinan, yan wan bê rûmet xistiye, ka em bibînin. Em ê vê meselê bi çar benda berdest bikin.

### I. PÊŞÎYA ÎSLAMÊ JÎYANA JINAN:

Li nav ereba, yan li dorhêla Mekkê, dema ku em li jiyana jinan mêze dikin, dil û hêvanê mere bi wan dişewite. Lewra ti rûmet ji wan re tine bû. Dema ku jinek ducan dibû, mêre wê pîrr tirs dikir ku Xwedê keçikekê bidê. Hema bila ne keçik be, çi dibe bila bibe...

Lewra keçik ji wan re ar û fedî bû. Dema ku keçik bûna ji fedya re nizanî bûn ewê xwe di kê derê xin. Xwe ji mirovê din diveşartin. Gelekî cara jî keçê xwe bi saxî dixistin binê axê û diveşartin (Yek ji wana Omer kurê Xettab e).

Dîsa jin ewqas bê rûmet bibûn, êdî ji xwe re bi wan dileyistin (weke îro). Wan rojên reş, Hz. Omer (r.a.) ji me re wisa qise dike:

“Me li Mekkê ti rûmet ne

dida jinan...”

### II. XELASKERÊ MIROVAHIYÊ JINAN JÎ XELAS DIKE

Jinê Mekkê, bi îslamê ji zulmê xelas bûne, tade ji ser wan rabû ye. Jin bi îslamê serfiraz bûne.

Bi hatina îslamê rûmeta jina, ji yekî derket hezara. Bi hatina îslamê zarokên keçik ji mirinê filitîn. Der vî barî Hz. Pêxember (a.s.w) wisa dibêje: “Behîşt, di binê lingê dayikan de ye.”

Behîşt di binê lingê kîjan dayikan de ye? Ne di binê lingên wan dayikên ku xwe rût û tazî dikin û hetanî êvarê li kuçe û bazaran digerin û hem xwe hem jî gelek kesan bi xwe, re davêjin agir. Dîsa behîşt ne di bin lingê jinên ku rûdinên û heta êvarê fesdaî û derewan dikin.

Behîşt di bîne lingê dayika Hz. Hesen û Huseyn de ye û dîsa behîşt di binê lingê Meryem a dayika Hz. Îsa de ye û dîsa behîşt di bin lingê Hz. Xedîce û Hz. Asîyê de ye û ewê mîna wan...

Îslam jin ne kiri ye bin destê zilam. Belkî îslam jin kiri ye şalyarê karê hundir. Îslam mafê bjijkiyê, mafê xwendinê û hwd. giş daye jinan.

Hz. Eyşe di cengê de li birîndara di nerî û birînên wan derman dikir. Gelek caran sehaban hedîsên Pêxemberê me ji Hz. Eyşe dibihîstin û hîn dibûn.

Ev şanî me dide ku, îslam mafê wek xwendinê gelek mafan dide. Me got îslamê wan ji mirinê xelas kir, îslamê rûmeta wan pîrrkir, îslamê mafên gelekî mezin dane wan. De îja kanî îslam ji wana ji dixwaz e?

### III. ÎSLAM JI JINA ÇI DIXWAZE

Xwestina îslamê bi ayeta Qur'anê eve:

*“Ji jinê bawerîn re bibêje, bila çavê xwe ji nêrîna heram bigurêzin, xemlê xwe yên (Ciyê ku têlê wan yên pêve tên arqilîn, ser gub, histu pî, çîp û uc' van cihê xwe) venekî. Lêbelê ji vana cihê hewceyî ji dîtina wan heye daniske (hariç). Bila temiziyê xwe ber ser pêsîrê xwe din (Bi awayê sîng û histu nexuya be). Cihê xemlê xwe ji mêrê xwe yan ji birê xwe yan ji lawê xwe yan ji kurê mêrê xwe yan ji kurê xuşk û brayên xwe yan ji jinên mistman yan ji dil kiriyê destê wan de yan ji xulamê hewcadariya wan tine be (ji jina)*

*strf li pê nanê xwe baz didin yan ji zarokên bê bi cibê jî-nayî veşartî ne esîyane pêve-tir şanî kesî nedîn.*"

Xwişkê min. Îslam ji me jînek bi vî awayî dixwaze. Ew Xweda yê ku me ji tine-tiyê çêkiriye, karîbû me bikira ax, dar û devî yan jî kevir. Karîbû me bikira ker, hirç. Em wisa ne kirin. Bi tevî vê hemî tiştên ku em hewcenin xist bin destê me ji bo me dide şixulandin, bizin, mî û çêlek şîr didine me ew navexwin, ewr ji me re baranê dişîne ti qencîya me nagihêje ji bona jiyan bûna me, roj tîrijê xwe rohnaiyê ji me re dişîne, dinya jî ji bona bibe şev û roj û ji bona bibe bihar û payîz û zivistan li dora xwe û li dora rojê digere, evan tiştê mezin giş ji bona me çêdibin û dîsa Yezdanê Dilovan ji bona hurê me yê biçûçik rûyê dinyayê xistiye mîna sifrekî. Sifrekî wisa ku ji hemî xwarinan li ser hatiye reşandin. Bihar jî mîna qevdek kulîlk daniye ser vê sifrê û pê madê me vedike.


Piştî Yezdanê dilovan, van tiştana giştik da me, em ê çawa xwe pê bidin hezkirin. Hûnê bibêjin gelo testê ji me dixwaze çi nin? Binerin di ayeta Qur'anê de ji me re çi dibêje: *"Min cin û mirov strf ji bo perestîya Min bikin, afirandîye."*

Lê binerin, di du evdîtîyê jî behîştê xwe jî me re soz dide. Zû bikin gelî xwuşk û brê min vê fersenda ji dest xwe

bernedin, lewra ko ji dest me here carekî dinê fersend tine ye. Fersende behîştê hew van rojê li mêvanxana Xweda de derbas dibe, lêbelê piştî ku me koçî dinya din kir, fersend namîne.

#### IV. JINÊN ÎRO

Temîna min li we be, hûn bi jinê îro nexapin. Xwuşkê min, bawer bikin ew jinên hûn dibêjin qey kêfxweş in û



şad in, ewan ne kêfxweş in û ne şad in. Li gora dervê wa diranê wan bi ken xuya dike. Te dî hinek dema ku ceyran wan digire diranê wan fiq fiq dike, yek ê nizanibe ew ê bibêje qey ev diken e. Îcar mesela wan jî wisa ye. Hundi-rê wan tije kerb û kul in,

dervê wan dikenin.

Ma hûn nabînin nav kuçe û bazara de wek xwe derxistinî mazatê. Ji ber çiyê? Sedema ku dev ji îslamê berdana ewqas bêrûmet bûnê, êdî kes li ruyê wan nanere. Lewra mîna zibil tije ne ew li kîja binerin li kîja nenerin.

Şad û kamûraniya jinan dibinê çarçef û temeziyan de ye. Dema ku çarçef û temezî ji ser xwe avêtin, him ji ber çavê mêrê xwe ketin, hem di ber çavên pêlîka bi wan dileyîzin ji bo benîstekî ji bona sabûnekî di televîzyonê de didin reqisandin. Li ser camê dikana carna jî di rojnamade dibêjin: *"Ji karkerên keçikre hewcetî heye."* Ji ber çi karkerê keçik? Qey ma mêr xelas bûne? Naxêr xelas nebûne, kuçe û qehwexanên tije rê me didin ku bi hezaran mêr li îş û kar digerin.

Ji ber vî hawî wan digrin. Ji bo mirov li keçika binerin werin eşya û pelî û pirtiyên ticariya xwe bidin firotin an bi wan kêfxweş bin peyva kin ji bona ticariya xwe û ji bona pertolên wan xweş bêne firotin li wan digerin. Xwuşkê min ger hûn li dinya û axretê şadîyê dixwazin, vê gotina Seîd ê Kurdî guhdarî bikin:

*"Kî tabm û şahiya jiyana xwe dixwaze bila jiyana xwe bi baweriyê bide jiyankirin, bi ferzê Xwedê xwe bi xemlîne û bila xwe ji guneban biparêze."*

## NAMEYÊN BÊCEWAB / 6

4 Sibat 1991

Ez dixwazim ji nava dilê xwe gotinan bigihînim te  
 Bi vî halê ponijîn û noqînê çî durdaneyan derdixin noqevanan  
 Ez di xewnê de tim bi cihina ve diçim  
 Belkî ji ber ku ji her cihê ku çûmê ez dixwazim biçim

Ez dixwazim ji te re stiranana bibêjim bi qedexetirîn zimanî  
 Ez dixwazim ji bil zimanên ku zanim bi zimanek din xîtabî te bikim  
 Ne kafî ne ji şerha halê min re zimanên ku ez zanim  
 Dibe ku ji ber vê be ku ez ji te re helbestên nameyî dinvîsim

Zêde nediyar e ku çî tiştî dixwazim, ez dixwazim bi tenê  
 Halek ji bil vî halî, zimanek ji bil vî zimanî  
 Leylake leylatir ji hemû leylayên qeşeng  
 Û diyareke ferahtir ji hemû ferahdiwaran

Ez behrê de teyr, berrê de maşî, azman de dar  
 Ez qatîlê maqtûl, ez hakimê mahkûm, ez neheqê heqdar  
 Her diyarê ku diçimê hê jî naye kişandin, hê jî tarûmar  
 Li pişt her deriyê ku ez divekim, dîwar û dîwar

Ev çî birîndariyeke îflah nabe ye  
 Çiqas tedawî bibe, hê jî xwînî e  
 Ev çî xencere ku, ko li dijmin xim  
 Berî dijmin, ez pê birîndar dibim

Dijraberim, bi qasî şairan dijraberim ez  
 Adem im ku cenetê de li cenetê digirim  
 Tu nizanî ku çî pêt û agir dişewitînin canê min  
 Min cenet ne eciband, ma ev cehenem e mustehecê min

Sabah Kara

## ELÎ HERÎRÎ

## ZEYNELABIDÎN ZINAR

Yek ji yên kevntirîn helbestvan û nivîskarê Kurd, Elî Herîrî ye. Ew di sala 1010 an de li gundê Herîrê hatiye dinê û di sala 1078 an de jî çûye dilovanîya xwe û li gundê xwe, di warga xwe ya daîmî de veşartî ye. Lê belê derbarê dema jîyana Şêx Elî Herîrî de, pir tarêxên ne wek hev hene. Berê pêşî, emê hin jêderkên cuda-cuda ji xwendevanan re binivîsin:

Pr. Qanadê Kurdo di *Tarîxa Edebiyata Kurdî-1* de gotiye, ku: "Elî Herîrî li gundê Herîrê nehîya Şemdînan sincaqa Hekariyêda sala 400 ê hicrî (yani sala 1009-1010) ji dayka xwe bûye û sala 470 hîcrî (yani 1078) çûye rehmetê û hema li wê derê jî hatîye veşartin."

Dîsa Profesorê Kurd gotiye: "Aleksandir Jaba di pirtûka xwe ya bi navê *Recueil de Notices et Rechist Kurdes* de nivîsiye, gotiye ku "Şairê Kurdan yê pêşîn Elî Herîrî bûye" û "Dîwaneke Elî Herîrî ya şêran û beytan li Kurdistanê da meşhûr û merûf e".

Dîsa jî Profesorê nemir gotiye, ku: "Albert Sosin di berevoka xwe ya bi navê *Kurdische Samlungen* (Peterburg, sala 1887, rûyê 275) de hel-

besteka Elî Herîrî çap kirîye."

Kovara *Hêvîya Welêt* jî nivîsiye, ku: "Elî Herîrî di sala 1009 de li gundê Herîrê bûye. Herîr yek ji gundê Bidlîsê ye. Di dema wî de Merwanî kardidestên welêt bûn û Diyarbekir ji xwe re kiribûn serekbajar" û "...di sala 1079 de çûye dilovanîya xwe."

Mamoste Cegerxwîn di *Tarîxa Kurdistan-1* de nivîsiye, ku: "Destpêka Dewleta Merwanî di sala 374 ên hicrî (984 mîladî) de bûye û di sala 564 (1169-70) an de jî pelîsiye."

Nivîskarê Kurd Ebdulreqîb Ûsiv di *Dîwana Kurmancî* de nivîsiye, gotiye: "Ez dibêjim ku Elî Herîrî di çerxa 10 ê hicrî (16 ê mîladî) de jîyaye. Eger hinek temenê wî ketibe nav çerxa 11 jî, ne dûr e ku bi temenê xwe ji Melayê Cizîrî mezintir be". Û gotiye: "... ji ber ku Şêx Ehmedê kurê wî, di sala 1048 ê hicrî de mirîye" (1638).

Herweha mamoste E. Ûsiv gotiye, ku: "Elî Herîrî li derveyê Kurdistanê miriye û gora wî ne li welêt e."

Bazili Nikitin di pirtûka xwe ya bi navê *Kurtler* (çapa Ozgurluk Yolu, rûpel 489, bi zimanê Tirkî) de gotiye: "Folklorê Kurdî ya dewlemend, çi dibe bila bibe divê

ku nê jîrkirin û di ciyê xwe de ye jî, ku dîroka wî miletî ya nivîsî pir bi dûr dikeve. Çimkî hêj di serê qirnê nehan de, li Şemdînan Elî Herîrî bi Kurdî nivîsiye û dîwana wî heta bi roja îro jî, bi destnivîs e."

Nivîskarê navdar M. Emîn Zekî Beg, di *Tarîxa Kurdistan* de nivîsiye, gotiye ku: Elî Herîrî di nav salên 1010-1077 an de li gundê Dêr-Herîrê jîye. Hevdemê eynî qirna hozanê Îranî yê navdar Firdewsî bûye. Dîwana wî bi hêsanî tê famê û bi uslûb e. Helbestên wî nazik û rewan û bi evînî ne (*Tarîxa Kurdistan*, Weşanxaneyê Komal, Temûz 1977, bi zimanê Tirkî).

Belê, nav û dengê Elî Herîrî li Kurdistanê gelek belavbûye. Ew bi navê "Şex Elîyê Herîrê" tê naskirin. Pir kes, helbest û gotinên wî jber dizanin. Xasma mele û feqe, di civat û caxiyan de jê bi xweşî dipeyivin û pesnê wî didin.

Lê belê îro di Kurdistanê de, agahdariya me bi dîwaneke ku bi navê Elî Herîrî be, tune. Lê bi devikî, helbest û gotinên wî pir digerin.

Di nav destnivîsarên me de, du bend helbestên Elî Herîrî derketin. Lê ew pêşî, di *Dîwana Kurmancî* de hati-

bûne weşandin. Û yek ji wan jî, pêştirê di *Tarîxa Edebîyata Kurdî-1* de hatiye weşandin. Û me wan çapên cuda rûqalê hevdu kirin, newekhevî di nav wan de hebû.

Em di wê bawerîyê de ne, eger ku lêkolînek li Elî Herîrî çêbibe, wê pir tiştên wî yên ku di tariyê de mane, diyar bibin.

Ji helbestên Elî Herîrî, benda pêşî 16 malikên çarkok in. Rêz bi heşt kiteyan dikişin û qafiyeya esasî "...t" ye. Lê diyar e, ku hin malik ji wê bendê kêr in. Lewra ku navê hozanê nemir di dawiyê de tune.

Benda diduyan, neh malikên çarkok in. Rêz bi heşt kiteyan dikişin û qafiye "...e" ye.

Du qesîdeyên şêx Elî Herîrî

#### **BEND: 1**

Dilê mehzûn kefarek bit  
Ki îmşeb taze mîhman têt  
Bi mizgînî beşaret bit  
Ki mîhman canê canan têt

Ki mîhman canê canan e  
Li ser çehvê me mihvan e  
Bi mala cumleyê xan e  
Ki şahê cumleyê xan têt

Were ey şahidê şêrîn  
Ji işqa te dil êxsîr in  
Bi can menzilgehê mîr in  
Telebkarê kî sultan têt

Telebkarin dîlara yim  
Medîm yarin bu wê şa yim  
Li bejna er'êrîn daîm  
Sîyehmar lê bi colan têt

Sîyehmaran kire seywan  
Li cotê şubhetê cîran  
Ku xas û 'am bibûn heyran  
Li cîran enberêşan têt

Du zulfên enberêşan in  
Du le'lên şekeristan in  
Eqîq û dur û mercan in  
Li hewza abiheywan têt

Ecêb berk e merarî têt  
Li seddê qewsê tarî têt  
Sîyehpencên xumarî têt  
Ji mexmûran du aslan têt

Ji mexmûran tu mexmûr î  
Bi cibhet Eqreba jor î  
Tewafa Beytîme'mûr î  
Li burcan xwîn bi seyran têt

Eqarîb hat û bê hed hat  
Li wê burca zeberced hat  
Vibala qewsê eswed hat  
Li telbê mahîtaban têt

Li hîva kewçîrîn kamil  
Vi ehlan ra nehiştin dil  
Û cumle da sefên sunbil  
Li hindavê gulîstan têt

Gulîstana xwedaresta  
Li çar etraf dilan xwesta  
Bineş û nêrgizan meste  
Cinîsrî le'l û reyhan têt

Reyahîn sosin û werd in  
Li Şex Elyê xerîb fer in  
Werestê ehmer û zerd in  
Her ro sed car di efxan têt

Ji efxanan nemaryim têt  
Du'agoyê tu ez bê vir  
Bibîte şer du esleh dir  
Heta vî qasidî can têt

Bibîne rûşemalîne  
Were hinda vibalîne  
Ji dest ahan û nalîne  
Çi rengferyad ji esman têt

Bi feryad û bi hawar e  
Ji dest ahan min ew kar e  
Me lazim bendeyî jar e  
Ji seyîdê çi ferman têt

Seyyêdê heq nezer vê ra  
Di iqlîman 'elem gêra

Qutara gewheran vê ra  
Ji nêv kana bedexşan têt

#### **BEND: 2**

Dîsa ji nû işqa berî  
Pur enderûn in ateş e  
Zulfa muzeyyen enberî  
De'wa digel xala reş e

Xala li dêmê dilreva  
Sed rûh û can im bin feda  
Sotim gelo çûm têt nema  
Terkem kirin eql û heş e

Eql û hişim bûne esîr  
Dinya ku geh geh têtê bîr  
Dêm şubheta bedra munîr  
Zulfa ji werdê bînxweş e

Werdan ji nêv zulfan derîn  
Şu'la bineşê têt werîn  
Bala û qeda er'êrîn  
Her ban li ser marê reş e

Dîsanê hey têt û diçit  
Ihyayê emwatan dibit  
Wechan mudam nûr jê diçit  
Dêm şubhetê şem'a geş e

Şem'a şebistanan ew e  
Werda gilîstanan ew e  
Sirê di bostanan ew e  
Şoxa Herîrî dilgeş e

Ecêb letîf û cindî ye  
Ezman nizane, Romî ye  
Ageh ji işqbazan nîye  
Mest û xumar û serxweş e

Serxweşê cama şerbetê  
Dêm şubhê şem'a zulmetê  
Horya di baxê cenetê  
Serdarê çendîn mehweş e

Mehweş ku westan sef bi sef  
Ew hate der Mîsrî di kef  
Wan got: "Elîyo la texef"  
Me b'mordinê qewî xweş e

(Ji kitêba *Nimûne ji gencîne-ya çanda qedexekirî*)



# QENDÎLA PIÇÛK

**XESSAN KENFANÎ / SABAH KARA**

*Wênevan:* **XESSAN KENFANÎ**

**W**ê rojê sibehê, bajar ji bihîstina xebra tehl, feryada derd dikir: Mîrê qenc, wefat kiribû... Ew Mîrê ku di hemû mudeta heyata xwe de bi edalet û dadgerî fermandarî kiribû û hemû miro jê hez dikirin.

Xem û derdê xelqê, her dem zêdetir dibû; him ji bona mirina Mîrê qenc û him jî ji bona ku Mîr ji bil keçeke piçûk ti kesî li pey xwe nehiştibû û ew keça piçûk nikaribû bi dewsa bavê xwe fermandariyê bike.

Lêbelê Mîr wesiyetekê ji bona keça piçûk hiştibû û di wê wesiyetnamê de me w z û e ke piçûk hatibû nivîsandin. Mîr nivîsandî-

bû:

**Tu wê gavê dikarî li cihê min rûnî û fermandariyê bikî ku tu tavê bînî qesrê.**

Û piştî wê şertê jî gotibû:  
**Heger te nikarî tu tavê bînî qesrê, gereke hemû umrê te di sendoqeke textik û devgirtî de bibhurê.**

Keça piçûk piştî ku wê wesiyetnamê xwend, bangkire zanişmendê qesrê û jê re got:

— **Bavê min kareke pîrr dijwar avêtiye histukura min; loma ez nikarim bi dewsa wî rûnim.**


Zanişmendê pîr got:

— **Adet û qanûna memleket ji z e m a n e k e pîrr dîr li ser Mîrzade wacib kiriye ku fermana bavê xwe bîne cih. Gereke Mîrzade bi dewsa bavê xwe hikûmet bike, da ku millet di xweşbextiyê de bije. Bavê te zilameke zana bû ku nivîsand:**

**“Yan anîna tavê bi qesrê**

**Yan jiyîn di sendoqa ji textê”**

Roja din,



Mîrzade ferman da ku biçin ser çiyayê bilind ê ku tav her roj ji wî alî derdikeve.

Mîrzade ji zanişmendê pîr fikra wî ya di heqê vî karî de pirsî û zanişmend jê re got:

— **Ey Mîrzadeya piçûk; gereke tu tavê beyî arîkariya kesên din bînî qesrê.**

Loma keça piçûk bi serê çiyayê bilind; lêbelê gava ku gehîştê şahîqa çiya, fam kir ku tav hê jê pîr dûr e û ti mirovî nikare dest bighîniyê.


Mîrzade pîr xemgîn û mahzûn vegeriya qesrê; deriyê oda xwe girt û rûnişt dest bi girî kir.

Piştî du roja Mîrzade di bin deriyê oda xwe de namê peyda kir; rahişte namê û xwend. Di wê namê de cumleke pîr kin hatibû nivîsandin:

**Tu nikarî tavê di odeke derîgirtî de peyda bikî.**

Mîrzade şexsê ku wê namê nivîsandibû nas nedikir. Bi dîqet namê meyzand û ji xwe re got:

**Gereke ez tavê bînim qesrê; heger ez naçar bi-**



**mînim, ez ê her roj derkevim çiyê.**

Piştî vê, Mîrzade ferman da ku li ser dîwarê derveyê qesrê îlanekê daleqînin û li ser binvîsin:

**Kî di anîna tavê bi qesrê de arîkariya keça Mîr bike, we cewahirên giranbiha bistîne.**

Tiştê nebuhurt ku hemû xelqê bajêr zanîn Mîrzadeya piçûk dixwaze tavê bîne qesrê. Lêbelê arîkarî ji destê ti kesî nedihat.

Hinin ji xelqê gotin:

**Mîrzade dîn bûyê; dixwaze kareke muhal û nemumkin pêk bîne.**

Hinin din gotin:

**Ew Mîrzadeke zana ye; lewra dixwaze kareke muhal pêk bîne.**

Lêbelê ti kes nikarîbû arîkariya Mîrzade bike.

Rojekê si-behê zanişmendê pîr hate qesrê û ji Mîrzade re got:

— **Firsenda di destê te de, dike temam bibe. Bavê te ji min re gotibû ku ez piştî mirina wî mûmeke mezin pêxim; heger mûmberî anîna tavê bi qesrê pêkeve û xilas bibe, gereke tu têkevî nava sen-**

**doqê û ceza nefermaniya xwe bikşînî.**

Gava ku pîremêrê zana ji odê derket, Mîrzade pîr zêde xemgîn bû û bi xwe fikirî ku ti carî wê nikaribe tavê bîne qesrê.

Di xewn û xeyala xwe de cilê mîrî li xwe kir... Ew cilê ku bi hişyarî nikarîbû li xwe bike.

Di wî halê xemgîn û ramanî de ji pencerê pîremêrêkî dît ku dike were hundirê qesrê, lêbelê pasban nahêlin werê.

Pasbanan pîremêr dûr dikirin, lê ew bi îrsar dixwest ku were nava qesrê.

Mîrzade ji pencera oda xwe vê menzerê dît û dengê pîremêr bihîst ku ji pasbanan re digot:

— **Ez dixwazim arîka-**

**riya Mîrzade bikim.**

Û dengê pasbanan bilind dibû ku digotin:

— **Ey pîremêrê nezan; tu çawa karî bi Mîrzade arîkariyê bikî?**

Pîremêr cardin feryad kir:

— **Bila, lê ji Mîrzade re bibêjin ku heger pîremêrek nîkaribe têkevêyê, wê çawa tav bikaribê têkevê qesrê?**

Pîremêr piştî vê gotinê, pišta xwe da qesrê û çû.

Wê gavê Mîrzade serê xwe ji pencerê dirêj kir û ji pasbanan re got:

— **Herin wî pîremêrî bînin.**

Lêbelê pîremêr pişî dîr çûbû û êdî xuya nedikir.

Mîrzade vegeriya nava odê, li ser gotina wî pîremêrî fikirî û hê zêdetir xemgîn bû.

Nizanîbû ku meqseda pîremêr ji vê gotinê çibû.

Piştî mudetekê fermandarê pasbanan xwest. Fermandar zilameke laşgir û qelantorî bû û deh sal di qesrê de xizmet kiribû.

Gava ku fermandar hate odê, Mîrzade jê pirsî:

— **Ma ew pîremêr**


**berê jî hatibû ber deriyê qesrê? Tu çi di heqê wî de dizanî, ji min re bibêje.**

Fermandar got:

— **Belê, ev pîremêr her şev têt, lêbelê pasdar nahêlin têkevê qesrê. Dibêjin dîn e. Ew zilameke feqîr e ku tim qendîleke piçûk di destê wî de heye.**

Mîrzade got:

— **Heger ev pîremêr sibe jî were, bihêlin bila**



**têkevê qesrê.**

Lêbelê roja din pîremêr nehat ber deriyê qesrê û cardin xem û derdê Mîrzade zêde bû.

Di wê hengama ku Mîrzade giriyeke kûr dikir, nameke di... di bin deriyê oda xwe de dît. Rahîşte kaxezê

û xwend; hatibû nivîsandin:

**Wext dibhure, mûma mezin dike biqede, girîkirin û xemgînbûn ti muşkilî hel nake.**

Mîrzadeya piçûk fam kir ku her çi zûtir gereke tiştekî bike û heger na, gereke heyata xwe di sendoqeke devgirtî de bibhurîne.

Loma fermandarê pasbanan xwest û jê re got:

— **Sibe bi şev her kesê ku qendîleke piçûk di dest de ye, bînin qesrê û li ber min hazir bikin.**

Fermandar bi metel û heyret got:

— **Ma ji bona pîremêreke dîwane?**

Mîrzade lê vegerand:

— **Gereke em guh bidin gotinê wî pîremêrî; dibe ku ew riya hella muşkilî me bizanibe.**

Roja din sibehê ferman-

dar, pasbanan xwest û li wan ferman kir ku li her aliyê memleket belav bibin û heta êvarî bisekinin; wextê ku dînya tarî bû, her kesê ku di dest de qendîleke piçûk heye, bigrin û bînin qesrê.

Wê şevê Mîrzade li ber

pencera oda xwe rûniştibû û cadê dimeyizañd. Li benda pîremêrekî bû ku di dest de qendîleke piçûk hebe.

Yekcar menzereke ecêbî dît; di asoya tarîtiya şevê de hezaran mirovên qendîl di dest de, ji her alî bi terefê qesrê de dihatin.

Tiştê ne-buhurt ku hemû gehîştin ber deriyê qesrê.

Cemiyeta qendîl di dest de her dem zêdetir dibû. Lêbelê ev hemû cemiyet nikaribûn têkevin nava qesrê, lewra derî pirr piçûk bûn.

Mîrzade li fermanber û xizmetkaran ferman kir ku deriyên vekin û dîwaran xira bikin, da ku hemû mirov bikaribin werin meydana qesrê.

Mîrzade jî hate nava meydana; fermanberê pasbanan pê re bû, da ku pîremêr peyda bike.

Wextê ku mirovên qendîl di dest de gehîştin meydana, ji zêdetiya nûra qendîlan, meydana weke tavê diberiqî û diçirîsî.

Fermanberê pasbanan got:

— **Ey Mîrzade; nika-**

**rim wî pîremêrî di nav van hemû mirovan de nas bikim; lewra hemû çehreyan mîna hev in û dişibihine hev.**

Nûr ewqas zêdebû ku Mîrzade ji zêdetiya nûrê nikaribû çavê xwe veke.



Dû re berê xwe da fermanber û got:

— **Min hergiz xeyal nedikir ku di welatê min de ewqas qendîl peyda bibin.**

Fermanber got:

— **Ew ji dîzan ditirsin.**

Zanişmendê pîr got:

— **Na, di tarîtiyê de her kes qendîlek piçûk di dest xwe de digre, da ku riya xwe bizanibe û nas bike.**

Pîremêr berê xwe da Mîrzade û got:

— **Ma gelo te karîbû van hemû qendîlan pev-re di destê xwe de bigrî?**

Mîrzade got:

— **Na.**

Zanişmend lê vegerand:

— **Mîna tavê; ew jî mestir ji wê ye ku mêrek tenê an jinek tenê bikaribe bi dest bigre.**

Mîrzade got:

— **Han, nûha min hemû tiştî fam kir... Naxwe ev qendîlên piçûk ên ku hatine cem hev, ew tav e ku bavê min dixwest!**

Zanişmendê pîr got:

— **Rast e; lêbelê de ka vî alî bimeyî-**

**zîne.**

Û pencerê nîşan da; nûra tavê di nava qesrê de diçirîsî.

Mîrzade qîr da:

— **Tiştê ecêb e ev; cara ewil e ku ev tişt diqede.**

Piştî mudetekê Zanişmend cilê mîrî li wê keçê kir û tacê bi cewahir li serê wê kir û jê re got:

— **Êdî tu Mîra me yî; bi dewsa bavê xwe de rûne. Te wesiyeta wî anî cih û te karî tu tavê bîne nava qesrê...**

# BI HELBESTÊN KURDÎ DENGÊ ÎSLAMÊ

## REÛF XWEDÊPEREST

Roj bi roj li Tirkîyê hinek tabû tên şikestin. Ji wan tabûyan yek jî di derheqê Kurdan û zimanê wan Kurdî deye. Heta çend sal berê kesî nikarîbû gotina (bêjeya) "Kurd" bîne ziman. Lê îro şikir ji Xwedê re li holê pîr pirtûk û kovarê Kurdî hene. Vî mafî ne bi kêfa xwe dane. Gelê me bi zorê ji wan standiye. Îşelâh ewe hemû mafên xwe jî bistînin.

Di şikestina vê tabûyê da mislimanan jî para xwe girt. Hindik be jî wan jî pirtûk û kovar bi Kurdî weşandin. Em bawerdikin ewê misliman dest bavên vê yekê û bi pêş de bibin.

Heta niha sê pirtûkên helbesta hatine weşandin. Ev sê pirtûk jî hev xweştir û delaltirin.

Ezê ji we re van sê pirtûka bidim nasîn.

### NALÎNÊN MIN

Pirtûka pêşî hate weşandin: *Nalînên Min* e. Vê pirtûkê birayê me hozan M. Şakir ê Koçer nivîsandiye. Tevî ferhengokê şêst rûpel e. Pêşgotineke xweş li ber heye. Helbestên di pirtûkê de cûr bi cûr in. Pirrayiya wan bi qafiye nin.

Hozan di pirtûkê da

wiha bang dike:

"Xewa giran tu xayinî  
Tu bindesta dixapînî  
Ji dîne pîroz bider dikî  
Ji herdû dinya bêkar dikî"  
(rûpel: 20)

"Em hevîdarin Yezdan ra  
Kesê bêkes her ew e  
Mizgîniyek hat me Kurdan  
re

Wextî roja me derkeve" (rûpel: 21)

"Xuşka min a xweyî îman  
Zînetê xwe veneke  
Nebe hevalê bêşerman  
Emrê Xweda jibîr neke" (rûpel: 29)

### BARAN

Pirtûka duyemîn: *Baran* e.

Hozanê delal A. Qadir Botan nivîsandiye. Tevî ferhengokê şêst û sê rûpel e. Pêşgotineke dirêj li ber heye. Helbestên di pirtûkê de bi pirrayî serbest hatine nivîsandin. Yên ku bi qafiye nin hindikin.

Di *Baran*'da hozan wiha dibêje:

"Xwîna Kurdistanê diherrikî

Doh li Dêrsim,  
Doh li Zilan,  
Doh li Helebçe,  
Doh li Kurdistan'a jor  
Wek xwîna Wîetnamê


Îro dîsanê insan qetildibin


Zarok, pîrek, pîr, dîsanê qetildibin

Dîsanê xwîn diherrike

Li erda Kurdistanê"  
(rûpel: 18)

"Kesek tine bêkes  
Heyî kesê herkes





# BARAN

ŞİİR

A. QADİR BOTAN

Gelo ji çi ye  
Dîsa mam bêkes” (rûpel: 25)

## DOZA JÎN

Pirtûka dawî jî: *Doza Jîn* e.  
Bira û hozanê delal Husyn Elî  
Başar nivîsandiye. Tevî ferhen-  
gokê 102 rûpel e. Wi jî wek  
hozanên din pêşgotinekî xweş

nivîsandiye. Pişt re jî Alfabeya  
Kurdî nivîsandiye. Ev ji bo  
xwendevanan pîr xweş bû-  
ye. Helbest bi qafiyê nin.

*Doza Jîn* wiha bang dike.  
“Ti netewe bi kuştinê nabin  
mexlûb

Kuştî ewin, ku li esîrî bûne  
metlûb” (rûpel: 39)

Lê mixabin navê tu weşan-  
xane li ser pirtûka tineye. Yanê  
her sê pirtûk jî keleş (korsan)  
hatine weşandin. Ev jî dide nî-  
şandin ku di nav mislimana de  
hinek tabû hê jî nehatine şî-  
kandin.

Bi daxwaza şikestina van ta-  
bûyan.

## DOZA JÎN

Helbest

Hiseyn Elî Başar



# kardelen

Aylık Kültür Sanat Dergisi  
(Mehnameya Çand û Huner)

**kardelen değerli bir Türkçe kültür sanat dergisidir.**

**Oku, okut ve abone bul.**

*(kardelen kovareke hêjayî Tirkî ya çandî û hunerî ye.  
Bixwîn, bide xwendin û jê re abone peyda bike.)*

ADRES (NAVNIŞAN): ÇAMLIÇA CAD. 36/A 81210 BEYLERBEYİ-ÜSKÜDAR-İSTANBUL

Yê ku bahsa Kurdan bike  
heman te dît ku dûvek pê ve  
kirin: Ewe komînîst e, na Ermenî  
ye, na "bolucu" ye û hwd.

Selamê Xwedê li we û li temamê mislimana be.

Ji ber ku we kovarake îslamiya kurdî derxistiye, zaf kêfxweş im û ji we re zaf spas dikim.

Birano! We di hejmara duyemîn de di derheqa du tiştan de raman û peşniyariya xwendevanan xwestiye, ez ji vê ji pîr kêfxweşim.

Hûn min mahzûr bibînin ezê di vir de hinek gazinan ji ronakbîrên kurd û misliman bikim.

Gotineka pêşiya heye dibêjin: "Ê ku neke hesêba wê bi çavê serê xwe bibîne ecêba." Vêca birano me zaf ecêb dîtî û emê hê zaf jî bibînin. Eve Helebçe, eve Dêrsim, eve Geliyê Zîla, eve Şirnex, eve ku û eve ne kûr... di derheqa van bûyeran de ronakbîrê me çi kirin? Me çi kir? Axayên me çi kirin? Mele û şêxe me çi kirin? Ez karim bi hêsani bibêjim ku teva jî alîkarî bi zaliman re kir û li ber barê mazlûma ranebûn.

Birano piştî tevkujiya Helebçe 15 roj qedîya bû di Batmanê partiyeka misliman mişing dikir. Kijan hatibê di hate ser kursiyê digotin: "bijî birayê misliman li Filistin, li Efganistan, li Bulgar li kû û ne li kû, lêbelê yekî bi tenê jî ne got: "Birano 15 hezar misliman li Helebçe hatin şehîtkirin. Ka em fatîhakê ji wan re jî bixwînin.

Vêca birano, mele di camiyana de wilo ne. Şêxên me wilo ne. Tevde wilo ne. Wisa ku yê bahsa Kurdan bike heman te dît ku dûvek pê ve kirin: Ewe komînîst e, na Ermenî ye, na "bolucu" ye û hwd. Hinek wextê ku behsa pîrsîgîreka Kurdan ji wan re dikî, te dît ku gotin: "Em ne nijadperestî." û piştî destê xwe lê dan û ev pîrsa ji ser û gubê xwe avetin. Em karin zaf tiştan bibêjin lêbelê rûpelê me têrê nakin.

Birano! Emê vêca wisa bibêjin, ka em karin çi bikin? Belê, ka em îro karin çi bikin?

Ezê di vê behsê de tiştêkî kin bibêjim: Em karin kovara derêxin. Em karin rojnama derêxin. Em karin civîna damezirînin. Tiştê mîna van, em karin gelek tiştan pêk bînin. Lêbelê tiştêkî zaf girîng heye, em çi bikin, bikin; em ji kû bînin, bînin; bihayê wî çi bibe bila bibe; pere be pere, xwîn be xwîn, mirin be mirin: Televîzyona Kurdî... Piştî televîzyona kurdî ji me re hêjaye arteşeke çekdar.

Ez di dawîya nameya xwe de dîsa selamê Xwedê û Pêxemberê (A.S.W.) wî li we dikim.

**M. Seîd Temel**

Doza Kurdan  
ne tenê doza  
sosyalista ye û  
ne tenê ya  
demokrata ye

Birêz xebatkar û berpîrsîyarên kovara Nûbihar,

Berî her tişt zor spas dikim jî we re. We xebatek pîr bi qîmet û bi rûmet dest pê kiriye. Rebûl Alemîn we serfiraz bike, alîkarê we be.

Hevalno,

Min pesna kovara Nûbihar, di rojnama Welat de xwend. Lêbelê navnişana Nûbiharê nenivîsandî bû. Li Enqerê min ji gelek pirtukxanan kovara Nûbihar pîrsî lêbelê bi dest min neket. Rojên derbasbûyî de rêka min bi Pirtukxana Dêrsimê ket û min hejmara 4'an û hejmara 2'an stand û min xwend. Gelek kêf û şa bûm. Kêf û şahîya min du celebî de bû.

Yekemîn eve ku: Kovarek bi zimanê Kurdî dihatê weşandin. Xuya dibû zimanê Kurdî tenê ne zimanê peyivê ye, yê nivîsê ye jî.

Duyemîn: Doza Kurdan ne tenê doza sosyalista ye û ne tenê ya demokrata ye, doza Kurdan doza hemû însana ye û hizbê Îslamî û hizbê olî jî gereke ser vê dozê bifikir e. Heya nuha li Kurdistanê hizbê olî li ser rewşa Kurdan çi dibêjin, dîtînet wan çi ye, kes nizanî bû. Kesên dîndar histuxar bûn. Di nav gel de rûşermî dibûn. Nûbihar vê kêmasiyê ji holê rakir.

**M. Emîn Ozdemir**

## Nameyeke delal, ji xwendevaneke hêja

**B**erî peyvê gelekî spas ji bona destpêkirineke we ya wuha bi xêr. Bi rastî cihê kovareke wisa, di nav kultura Îslamiya vî welatî de xuyanîbû û çavê me jî li rêya tiştekî wisa bû. Kovara me li gora nûderketina wê -pirr ne be jî- lê baş e. Wuha jî xuya di-be ku ewê hê jî baş be însaelah.

Niha ko ez dest bi gotina xwe gişî bikim ewê pirr dûdirêj be. Ez ji nivîsandinê û hunê jî xwendinê eciz bin. Loma min hinekan ve-gerand çend pîrsan û hinek jî min kin birrîn. Dil dixwaze ku hûn, bi ciddiyet li ser van çend peyvên bisekinin.

Bi rastî em ji tişkî wanî re pirr tî bûn. Ji bo ku em ji gelkî "yetamên umetê" ne. Lê tîrsa min ew e ku em ji ber vê tîbûna mezin em vê avê bêhiş vexwin û xwe biêşînin.

Seidê Norsî, belê alimkî me yê mezin e û em jê hezdirin û dîsa pêwîst e ku merev wî bi şiklê wî yê "otantik" bide naskirin. Û ji destê nijadperistên ku wî alet dîkin, derxînin. Lê dîsa jî, cihê wî di nav hemû alimê me yê Îslamê de çî ye? Li gora esas û fundamentalê dînê me cihê wî çî ye? Ma ne pêwîst e ku merev hereket û metodên wî tehlîl û rexne bike? Ma gelo tehlîlîkirin, tenê qala mezinatiya wî û nepixandina wî ye? (Ev bi xwe ji alim û rewşenbîrên me yê dîn -û jî wî re jî- bê hurmetî ye, ma ne wisa ye?)

Peyvekê wî heye, dibêje: "Mirina min ewê weke bombekî bi serê we (zaliman) de biteqe." Li gora ku heta niha neteqiya ye, em karin bipîrsin: Ev bombe (ji bo mezinkirin û nepixandina me ya derê hed) li serê me neteqe?

Em îro zanin ku tiştê ku hatiye serê me (serê gelê me û umeta me) tenê ne ji destê dijminê me yê adî ye. Pirrên wî jî dostê me yê gêj in. Em bînin bîra xwe ku di "Herba Azadî (I)" ya Kemal Paşa û pê de (di cihdanîna kultura Kemalîstan de) ked û ta'b û xebatên mislimanan çî bû? Ji bo dînê Îslam û ji bo azadiya welat li hemberî emperyalîstan rabûn û dawiyê ked û xwîna wan ket kîsê Kemalîst û nijadperistan... Ji bo bê tedbirî û gêjî em hatin heta vê rojê...

Niha jî em vê pîrsên xwe yê -li gora min- pirr giring bikin û hûn jî pirr li ser bifikirin qey ne hêja ye?

Heger em tarîxa Osmanî û TC û tarîxa îro bidin ber hev, gelo kovara Nûbihar mîna kîjan kovarên wê çaxê ye û rola wê mîna kîjana ye? Gelo ta'b û ked û xebatê me ewê here kîsê nijadperest û diktatorên me? Ber vê ka tedbîra me çî ye? (Hûn vê zanîbin ku em "Namiik Kemal û Hekimoglu Ismail ê Kurdan" naxwazin.)

Îro hinek sosyalîst û nijadperest didin bin çengê me û me dinexînin. Ew tedbirê jî leşkerî heta sazumanî, heta aborî girtin e û ji mere qala azadî bi hevjinê dîkin. Gêjê me jî xwe wenda dîkin û pişt didin wan û di paralêla wan de dibêjin. Û gelek jî alim (!) di nav sazumanên wan de dişuxilin. Û bi vana gelê me yê misliman dixapînin û didin alî xwe. Bi vî hawî potansiyela me dişuxilînin. Û em jî dibin rewş û sîsa wan. Me bi vî hawî dîkin aleta rêya xwe. Gelo qey ew gêj û chmeqanan giş xain in? Na, lê em baş nafîkirin û ji tarîx û çirokan îbret nagirin. Ko em naxwazin kovara me dewlemendiyeke sosyalîst û nijadperistan be, pêwîste ku em hişyarbin û tedbîra xwe ji niha de bigrin. Bila keda me çarkê jî ji me re bimîne.

Pêşniyarek min jî heye: Bi alim û rewşenbîrên Îslamî yê Kurdistanê re hevpeyvîn bikin û wan bi me bidin naskirin. Li ser bûyeran, fikrê wan bigrin. Bîlexes li Iraqê û li Îranê alim û serokên hereketên Îslamî re roportajan bikin ku em wan nasbikin û ji gel re qala wan bikin.

Peyva dawîn ji ev e: Ma bes nîne gotinên rebenî û belengazî li ser Kurdan? Çima ji peyvên we hêsiir tînen? Ji xwe giriyên ku gelê Kurd dike, besî wan û me ye jî. Em (yanê rewşenbîrên Kurdê Îslamî) pêwîst e ku bi xwînsarî li meselê binêrin û stratejîne nêrbar tesbît bikin û bi cih bînin.

"... Ma sibe ne nêzîk e?"

Me dî ku alfabeya Nûbihar bi latînî ye. Lê herfên alfabeya pirrî Kurdistanê (Kurdîstana Başûr, Kurdîstana Îranê û hemû medresên Kurdistanê) bi herfên erebî ye. Belê em bi latînî çêtir fam dîkin, lê ev jî heye ku elfabe erebî sembola kultur û medeniyetê ye. (Îro li Asya Navîn de, mucadela Îslamî û ya Frengîtiyê pirr li ser elfabê ye). Em bînin bîra xwe



Kemal Paşa ji bo çi elfabeya erebî bi zûkayî quliband latîni. Wî baş zanîbû ku ancax bi vî hawî wê me ji hemû kulturê Îslamî dûr bike. Bi zorî be jî îro em bi vê alfabe hevûdu fam dikin û anihati îtiraza me lê tine. Lê heger proje û nêta me ji medeniyetekê re heye, wî çaxi gereke em hişê xwe binin serê xwe û tedbîr û haziriyê xwe jî ji alîkî de bigrin.

Velhasil îro madem herfê latîni (seba Tirkîyê) hîn jî tê îşê me û li fêda me ye, mecbûrî emê bi vî hawî binivîsinin. Lê dîsa jî dilê me di herfên erebî de ye, çima ku herfên elfaba medeniyeta mislimanana ye.

Di kovarê notasyona hinek ji herfên Kurdî jî tine ye. Yanê dengê wî heye lê herf lê nehatiye danîn.

Wek: Şuxulandin, xerîbî, xeyidî, tuxyan... hwd.  
Wek: Hesdîkin, hetta, herrî... hwd.

Ev herdu di elfaba latîni de kêmasiyên wan hene. C.E. Bedîrxan di gramera xwe de du herfên din teklîf dike. Pêşniyara min ev e ku hun muheqeq li ser vê bisekinin. Çima ku xwendin û famkirina nivîsê jî bo vî hawî zor dibe.

Min vê mektup û karpêka xwe ji mesuliyetê de şand. Seba wî ku min dûdirêj kiriye û min serê xwe eşandiye, qusura min nenêrin.

Dawiya peyvê: Selama Xwedê li ser we be.

**Bedîrxan Ekin**

**Afirandin:** Yaratmak, meydana getirmek.

**Agahdarî:** Bilgi sahibi olmak.

**Ajne:** Suda yüzmek, yüzücülük.

**Ajne dikin:** Yüzüyorlar.

**Arîkarî:** Yardım.

**Babet:** Dair, ... hakkında.

**Berr:** Kara parçası, "deniz" karşıtı.

**Bexşayî:** Bağışlama, bahşetme.

**Bêfasile:** Ansızın.

**Bi îstîlah:** Sözde.

**Bijîjkî:** Tababet, hekimlik, doktorluk.

**Binavûdeng:** Namlı, şanlı, tumpurak.

**Birûmetanê:** Şereflice.

**Cax:** Çağ, devir.

**Cihceh:** Yer yer.

**Civandin:** Toplamak.

**Çaplûs:** Dalkavuk, yağcı.

**Çaplûsî:** Dalkavukluk, yağcılık.

**Çareserkirin:** Çözümlemek, çözmek, çare bulmak.

**Çarkok:** Dörtlülük, kıta.

**Çek:** Silah.

**Çekên kîmyewî:** Kimyasal silahlar.

**Dadgerî:** Adalet.

**Dagirker:** İşgalci.

**Dagirkerî:** İşgalcilik.

**Didomîne:** Sürdürüyor.

**Dijraber:** Zıt, karşıt.

**Dijwar:** Tehlikeli.

**Dilgeş:** Mutlu, şad.

**Diyarbûn:** Belli olmak, belirlilik.

**Domandin:** Sürdürmek, devam ettirmek.

**Durdane:** İnci tanesi.

**Fermanber:** Ast.

**Fermandar:** Komutan, üst

**Firsend:** Fırsat.

**Gulan:** Mayıs ayı.

**Gurêz:** Sakınmak, ictinab.

**Hevpa:** Dost, yandaş, suçortağı.

**Hezirandin:** Düşünmek.

**Ji bil:** Başka, gayrı, ...dan başka.

**Jîndar:** Canlı, sağ.

**Kamran:** Mutlu, muzaffer, başarırlı.

**Kerî:** Sürü.

**Keştî:** Gemi.

**Lanetker:** Lanetçi, lanet eden.

**Loma:** Bu nedenle, bu yüzden.

**Lorîn:** Ninni.

**Mersiyê:** Ağıt.

**Mertal:** Kalkan.

**Mirov:** Kişi, insan.

**Mîna:** Gibi.

**Navnetewî:** Uluslararası, beynel-

milel.

**Nediyar:** Belirsiz.

**Nefermanî:** Disiplinsizlik, itaatsizlik..

**Nemirovanî:** Şerefsizlik, insanlıkdışılık.

**Nespaşî:** Nankörlük.

**Neteweyên Yekbûyî:** Birleşmiş Milletler.

**Noqevan:** Dalgıç.

**Noqîn:** Dalgıçlık.

**Nûcevan:** Muhabir, gazeteci.

**Otantik:** Gerçekçi, hakiki

**Pasban:** Muhafız, nöbetçi, gardiyan.

**Peristû:** Tapınmak.

**Pesn:** Övgü.

**Pêbend:** Ayakbağı, ket.

**Pêt:** Kor.

**Ponijîn:** Dalmak, düşünmek, talsalanmak.

**Qedexekirin:** Yasaklamak.

**Qeşeng:** Güzel.

**Qurmişandin:** Buruşturmak, soldurmak.

**Raman:** Düşünce, fikir.

**Rewşen:** Aydınlık.

**Rêwenda:** Şaşkın.

**Rûpel:** Sayfa.

**Sazûmana Ewlekarî:** Güvenlik Konseyi.

**Sebirmend:** Sabreden, sabırlı

**Serzemîn:** Yeryüzü.

**Sûddar:** Yararlı, kazançlı.

**Şahîqa:** Doruk, uç nokta.

**Şalyar:** Bakan, vezir.

**Şalyarî:** Bakanlık, vezaret.

**Şano:** Sahne.

**Şirove:** Yorum, açıklama.

**Şirovekirin:** Yorumlamak, açıklamak.

**Taxût:** Tağut.

**Temen:** Yaş.

**Tevkujî:** Katliam.

**Tewbeqebûlvan:** Tevbeleri kabul eden.

**Tewr:** Tavır.

**Tewr:** Asla, hiçbir zaman.

**Ûmre:** Umre, Hac ziyareti.

**Werge:** Öyle, böyle, şöyle.

**Welidandin:** Doğurmak.

**Weşandin:** Yayımlamak.

**Weşiya:** Yayımlandı.

**Xazejehr:** Kimyasal gaz, zehir.

**Xemgîn:** Gamlı, hüznü.

**Xeternak:** Tehlikeli.


**Xirabxulq:** Kötü huylu.

**Zanişmend:** Alim, bilgin.

**Zanişmendê qesrê:** Saray bilginini, saray nazırı.

**ÇEPELAST**

1- Sala 1864 hate dinyayê. Zana, rew-  
şenbîr, alim û serokê serhildana sala  
1925'a ya ku li hember Dewleta Ke-  
malîst bûbû ye. Piştî çend mehan bi  
xiyanetê hat pêgirtin û tewqîf bû. Di  
sala 1925'an de li Diyarbekirê bi tevî  
hevalên xwe îdam bû (Resmê di navê  
de) - Tebeqa ser mast, qeymaq 2-  
Şer, şermezarî, fehêt - Heyf, tol -  
Germ, heraret 3- Çilm - Bûyera di  
navbera Hezretî Elî û Muawiye de  
(Berepaş) 4- Nîşan, şanî, elamet -  
Navê heywanekî (Berepaş) 5- Ling,  
nig - Xezal 6- Hejmarekî (Berepaş) 7-  
Di muzîkê de notakî - Pêkanîn (Be-  
repaş) 8- Ciyê pez lê têtê dotin (Be-  
repaş) 9- Şeqam, şîlpax - (Berepaş)  
dengê pez 10- Kesê di sinetê de za-  
rokan digire - Beş, pişk, pay 11- Cî-  
ran, bevsê, hevsê 12- Kulek a ode yê  
- Çêleka sê salî



**SEREJÊR**

1- Navê mezhebekî Îslamê - (Bere-  
paş) navê sebzekî - Mam 2- Hucum,  
pelemar - Tov 3- Aştî - Qolinc 4-  
Navê heywanekî - Pale 5- Bawerî,  
îtimad - Şûnd, cih (Berepaş) 6- (Be-  
repaş) Pirsra dîtinê - eşq, sewda 7- Di  
zimanê Îngilîzî de "na" 8- Wesfên  
ewlîyayê  
Xwedê -  
Proja ku li  
Rihayê, ji  
alî Tirkiyê  
de hatiye  
hasilkirin  
(Berepaş)  
9- Ambûrîn,  
malzeme  
(Berepaş) -  
(Berepaş)  
Dewletekî li  
Rohelatê  
10- Ol -Ba-  
jarekî Kur-  
distana Ba-  
şur

**BERSIVA RÊZEPIRSA HEJMARÂ SESEM**

**ÇEPELAST:** 1- Ehmedê Xanî. 2- Hermê-Êvar. 3- Al-Îmalat.  
4- Dîhn-Sînor. 5- Îsa-Îra. 6- Yewm. 7- Ba-Alû. 8- Txeb-Nas.  
9- Şeş-Bala. 10- Pa-Yeqîn. 11- Avên-Ar. 12- Rîs-Alîsor.

**SEREJÊR:** 1- Ehadiyet-Par. 2- Helîse-Avî. 3- Mr-Hawbeş-Ês.  
4- Emîn-Mabeyn. 5- Dêim-Şe. 6- As-Qil. 7- Xêlî-Bî. 8- Avanî-  
Ananas. 9- Nator - Lal - Ro. 10- Îr - Ramûsan.

**Amadekar: ELÎ KEÇELÎ**

**KARTA ABONETIYÊ**

Ji kerema xwe ve ji hejmarê [.....] pê ve min bikin aboneya/aboneyê kova-  
ra *nûbihar*.

**Nav û paşnav:**

**Navnîşan:**

**Jimareyên hesabê ji bona razandina bedela abonetiye:**

**Li hundur:** Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

**Li derve:** Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 -  
3118770

Ji kerema xwe ve, Karta Abonetiye dagirin û tevî kopiyêke pela razandina be-  
dela abonetiye bişînin navnîşana me.

**Navnîşan:**

Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3 Fatih - İstanbul Tel: 524 00 38 - 533 75 88

**Bedela abonetiye:**

**Li hundur:** 120.000 TL. **Li derve:** 50 DM.

# Tevhidî Çizginin Sesi İslâmî Düşünce Dergisi

**İkinci yılında daha geniş yazar kadrosuyla  
size daha yakın olacak ve daha geniş hizmetler sunacak:**

- Hepsi 120.000.- Lira !  
✓ 12 Sayı İslami Düşünce Dergisi ve 100.000 Liralık Hediye Kitaplar
- 50.000.- Lira karşılığında 1 - 12. sayılar ödemeli gönderilir.
- İslami Düşünce kitaplığındaki her kitap, % 50 indirimli olarak abonelerine ödemeli gönderilir.
- Dört Abone yapan; ücretsiz abone yapılacak.

*"Daha gür tevhidî bir ses için,  
güçlerimizi birleştirelim."*

**Not :** Abone için 120.000.- Lirayı 527780 nolu Mustafa Gök posta çeki hesabına yatırmanız, adınızı, adresinizi ve abone bedelini yatırdığınıza dair makbuzu bize göndermeniz yeterlidir.

**Adres:** I - **İslâmî Düşünce Dergisi**

İzmir Caddesi İhlamur Sokak Tuğaç Han 6/49

Sıhhiye / ANKARA

Tel : 231 30 02 Fax: 231 30 02

II - 14. Durak Özelif Sitesi 4. Blok No: 75

Demetevler Ankara

Tel: (4) 336 38 33

